


**Surgun, penaberî
û hin problemên
girêdayîyê wan**

J. Eşpar

Rûpel 6



*Ta kîngê pot û pertal li nav milê me be/ Ta kîngê çol û pesar warên me be/
Ta kîngê li ser axa xwe jî koçberî para me be?*

*Li Kurdistanê malan dişewitînin,
xelk koç dike*

Gund vala dibin


Dewlet, bi navê harekata hundirîn, li Kurdistanê gundan vala dike. Ev politikayên kolonyalist gundiyên Kurd, ji erd û warên wan, qut dike. Gundî li navçe û navendan kom dibin. Bajar wek barûdê li benda çirûskeke ne. Rûpel 8

Amed germ dibe

Zivistan sar e. Li ser erdê bostek qeşa heye. Gure gura soba agir e, lê sobe mirovên Amedîyan germ nake! Êrîşên partîzanan, neyarê hov ê li dijî mirovahiyê dixê quncikê wan û dilê Amedîyan hênîk, Amedê jî, germ dike.

Î. Xort, ji Amedê dinivîse...

Rûpel 8



**Pêxwas li
guherînên
civakî
qelibî**

Rûpel 16



**Kurdistana
Balkan:
Bosna
Hersek**

Rûpel 4



**Çîrok
Gulîstan**

Rûpel 13

Zewaca bi jinên biyanî re

Nivîsa min dê ji hinêkan re tal û tûj, ji hinêkan re ji biyanî bêt. An ji dê bi çavêkî nijadperest lê bê nêrîn. Lê dê tiştan ji binin ber çavên xwe. Gelo pêvajoya neteweyî di çi rewşê de ye? Çima ev mirov wiha dikin, sebêbê van çi ye? Belê ev nivîsa min li ser ew mirovên ku bi kesên biyanî re mahrê kirine û dikin e, nêrîna min li ser van kesên e.

Bi sedan kesên me, mahrê bi kesên biyanî re kirine û ji wan jî gelek kes bi nav û deng in.

Û ji wan nizanin Kurd in ji hene, an jî neteweyiya xwe bi mirovên ku pê re zewiciye re qebul kiriye. Ez li yên kesên ku neteweyiya xwe winda kirine re, kêma nabînim. Lê ez li yên ku pêşengiya barê neteweyî dane ser milên xwe, kêma dibînim. Gotinên min ji wan re ye.

Warê ku em tê de dijîn, tu war ne di vê dijwariyê de ye. Her serwer, barbarî û qirêjahiya xwe kiriyê nav me û her tim diwxazin me winda bikin. A yekemîn mahrê kesên biyanî re, ji bo zimanê me çewt e. Ji ber ku di zewacê de zimanê serwer tê axaftin. Mixabin zimanê me ne serwer e û parastina sazende ya ziman pîrr qels e. (Em dikarin bibêjin tune ye)

Û çewtiya vê yekê biparêze

û bibêje zarokên min, bi zimanên neteweyiya min dipeyvin gelo bi çi awayî fêr bûne û di çi rewşê de jiyane? Pêwsit e mirov vana bînc ber çavan.

A duyemîn pêşeroja wan zarokan ji bo me ne ronahî ye. Bê şik dê rabin neteweya serwer biparêzin. Mînak, Tirk û Kurdên ku bi hev re dizewicin zarokên wan dikevin rikatiyê. (Zarokên mirovên şoreşger). Dayik Tirk û zimanê dayikê serwer e. Bi rabezin şovenizma wê akam dike li ser zarokan an jî, zarok bi alî dibe.

Di zewacê de, yek serê xwe ditewîne ew jî yê ku Kurd e. Gava dijîtiya wî tê kirin di wê rewşê de jî zarok li hêla neteweya serwer dimîne.

Gelo çima rewşên bîrên Kurdan wiha kirine û dikin? A yekemîn neteweya xwe biçûk dibînin-bi zanistî û bi nezani-A duyemîn keçên Kurdan layiqê xwe nabînim. Ne xwedî tolerans in û di perwazekî wekhevî de nikarin keçan qebûl bikin.

Rewşa keçên Kurdan çi be jî (xwende nexwende.) dixwazin bibe qerwaşa wan. Wek ku ew dibin qerwaşa jinên biyanî. Lê belê ne xem e, gotin ji amade ye. Kultura jinên biyanî wiha dixwaze, wek haya me ji wan tune be.

Heyf e, lê ev jina bê rûmet û qerwaş jî, ji we re pîroz be. Ev pîroziya giranbuha bi navê sosyalîzmê, welatperweriyê, demokrasî û wekhevîyê berde-wam dike.

Dema keça Kurd, maf û rûmeta xwe diparêze, mêrên Kurd bi gotinên xemilî dijîtiyê dikin, norm jî parastina kultura feodalîzm û kevneperestiyê ye. Hinek îro dikarin bibêjin me qerwaşî di zewaca xwe de qebûl nekîr, ger wiha bibêje ne jinên biyanî berî we nedane?

Rawestina me ya li ser vê bûyerê jî girîngiyekê tê. Ev jî zimanê zikmakî ye. Ma dijîtiya xanifandin (asimilasyon), parastina kultur ne ji malbatê tê? Di tunebûna sazende ya kulturî de, di avakirina hêlineke wiha pûç de, em dê çawa xwe li ser lingan bihêlin?

Jiyandina zimanê me heta îro di hemû dijwariya xwe de sedem yek jê, ne hêlineke xwerûstî bû? Rêgaheke sazende ya naturî û lisanekî petî li ser maha Kurdî ava û peyde dibe. Hûn dikarin bibêjin ev nijadperestî ye. Lê ev rastiyeke tal û tûj e di realîta me de. Di dîroka rewşên bîrên de şermezariyek çewtî ye.

Ji hêlekî ve em dê parêzvan

bin, ji hêlekî din ve ji em dê pelçikvanê hêlinê bîn.

Gotinên min ji lêkolînanên zimanparêz re ne. Ka zarokên Dr. Qasimlo, ka zarokên Dr. Şivan û yên wek wan? Sebêbê windabûna zarokan ku be sedan e çi ye? Ev pîrs bersivê dixwazin. Divê mirov rûnê û birame.

Hûnê bibêjin, ma ji bo mahrkirina jinên biyanî çi akama wê heye, li ser kar û barê niştîmanperweriyê? Ez dibêjim nuqta herî girîng jî ew e. Awerte nabin mînak. Lê di perwazekê giştî de li pêşiya erkên niştîmanî de asteng û alozî dertên. Tu car ên ne ji neteweya me, di kareki wiha canfida de xwe bi gorî nakin. Eger em bi durustî di vî karî de hebin dê malbat hilweşe. Di xebata niştîmanperwerî de, dualîti herdem ser-tewandinê tine.

Bê gotin herkes qebûl dike dijwarî ya ku gel û welatê me tê de ye. Pêwîst e her mirovê xwedî rûmet di wî warî de birame û rewşa ku zana û rewşên bîrên me di zewacên xwe de, çi xetereyan anîne, baş binirxînin.

Ez van pîrs û pîrgirekan dihêlim ji raya giştî re.

Zozan Maldan

FERHENGOK

Argûn: Pixêrî, şomine
Belakir: Kesê nerihet
Bersivandin: Bersivdayîn, cewabdayîn
Bîrewer: Rewşenbîr, ronakbîr
Çespandin: Tatbîqkirin (uygulamak)
Çespîn: Tatbîq (uygulama)
Dûring: Mesafe
Ewezî: Telafî
Ewezivegerîn: Telafîkirin
Ferqizandin: Jê pekin, pijiqîn (fırlamak)
Geremol: Tevlihevî, anormalî
Gewende: Mîrtiv, mitrib
Givale: Terimek leşkeriyê ye (bölük)
Gog: Top, di futbolê de
Gon: Reng
Gonandin: Rengdayîn, boyaxkirin
Guhaztin: Neqil, transfer
Gumlat: Lod 'Loda genimê te bi çiqasî?'
Hengame: Şemate
Hetikandin: Rezilkirin
Hevta: Weke hev, hempa
Heyam: Dem, gav, wext
Kendav: Delav, xelîc (körfez)
Kêrendî: Qirîm, tîrpan
Kîşwer: Parzemîn, kita
Mencenîq: Aleteke şer ku gulokên agir an jî, keviran dipekinê (mançnık)
Mizawir: Kesê ku jê re dibêjin nerehet, netebitî (afacan)
Nasdar: Kesê ku tê naskirin
Pangeh: Axur
Peyitandin: Tesbîtkirin
Pîresê: Cadû, cazû (cadı)
Qurifandin: Ferihîn, tîrsîn
Regeze: Element (unsur)
Rewist: Sinc, ehlaq (karakter)
Rik: Kîn
Rîkok: Kînok
Rûbar: Robar, çem
Sêrebend: Sêrbaz
Sindan: (örs)
Sîqal: (cila)
Şû: Mêr (koca)
Xerat: Marangoz

Dem dema yekîtiyê ye

Di hejmara Welat a 44'an de nameyeke I.Omerî hate weşandin. Ez dixwazim çend gotin li ser wê nameyê binivîsim. Xweşnêrîna we û ya I.Omerî daxwaza min e.

Heval I.Omerî ji du eşîran xeber dide. Ev herdu eşîr Hevêrka û Dekşûrî ne. Di vê mijarê de ez nizanîm pîvana I.Omerî çi ye? Çawa eşîrêkê tev dike xayîn û yekê dike welatparêz? Mafê tu kesî tune ku navê eşîra wilo bide nîşandin. Erê serok û axan ji yê Dekşûriyan bi dagirkeran re bûne yek. Lê di nav wê eşîrê de welatparêz jî pîrr in. Dibe ku cerdevan û noker jî gelek hebin. Lê ew tu carî nabê pîvana lewitandina wê eşîrê.

Şêxmûsê Çelebî ne Dekşûrî ye. Hevêrki ye û pismamê mala Haco ye. Ji ber berjewendiyên xwe ew û mala Haco bi hev ketin û ew bi Dekşûriyan re bûne yek. (Di vî babetê de min di sala 1991'ê de hev-

peyvînce girîng bi Usivê Elîkê Batê re kir) Ez dixwazim ji hevpeyvîna Usivê Elîk minakekê binim: "Di serhildana Şêx Seid de, bi Serokatiya Hesênê Haco, Eşîra Hevêrkan jî li ba Tirkiye çih girt." Ma kesek karê îro bêje Eşîra Hevêrka xayîn e? Mafê kesekî tune ku navê eşîrêkê xira bikê. Ew ji bo welatparêzên wê eşîrê dibê heqareteke mezin.

Çiqas serhildanê ku heta 1940 an li Kurdistanê çêbûne, giş bi cihêkirina eşîrtî û eşîran têk çûne.

Îro ji bo gelê Kurd û Kurdistanê rûpeleke dîroke nû vebûye. Qedera gelê Kurd hatiye guherandin. Ji eşîrtî bend û berberiyê derbasî neteweyiyê bûye. Ev jî bi pêşkêşîya PKK'ê hatiye damezrandin. Yekîtiya gelê Kurd inçex bi vî awayî pêk tê. Ne bi ramanên tengnêrîn, eşîrtî û herêmî... Silav ji şoreşa Kurdistanê re.

Jir Dilovan

Nivîsên hînkirina Kurdî

Berî her tiştî jî bo derketina "Welat" we ji dil û can pîroz dikim.

Ez rojnâmeya Welat ji hejmara yekemîn-heta hejmara dawiyê bê kêmasî dişopînim. Ji vir û pê ve jî, heta ku ji destê min bê ezê bişopînim û alîkariya xwe bidim wê.

Bi dîtina min derketina Welat bûyerê girîng e. Ji ber ku, di dawiya demekê dirêj de û di nav gelek dijwarî û zordariyan de

derketiye. Divê em rewşa derketina Welat binin ber çav girîngiya derketina Welat baş fam bikin û bi vî awayî li Welat xwedî derkevin.

Bi ya min, rojnâmeya Welat, di nav rûpelên xwe di nivîsên jî bo hînkirina zimanê Kurdî zêde bike ew dê serketina xwe bi pêş ve bibe.

Serketina we daxwaziya me ye.

M. Mahsum Tanırkulu

Ordiya bavo ya şefaf

Metropol ji bo insanên Kurd ên welatparêz jehr e. Ev îro 3-4 roj in ya leşker welatparêzan ji malên wan berhevdikin wan dibine qereqola Adala (navçeyê girêdayî bajarê Manîsa ye) û heta ku dixwestin li wan dixin û dibêjin, "Hûn li van deran destgiriya PKK'ê dikin, hûn PKK'ê dihebînin û ji me re dibêjin "ji van deran herin. Biqêşitin hûn diçine ku herin bes li vir nemînin." Silo di hemû xebirdanên xwe de dibêje "Bîrlîk ve Beraberlik", belê ev gotinên başçavuş li dijî yekîtiyê û wekhevîyê ne. Çima em biqêşitin? Maneya vê gotinê pîrr girîng e, divê

mîrovê baş bizanibe. Li ser seran û ser çavan, emê biqêşitin, lê mala we ava ku hûn jî zanin, em Kurd in û em nabine Tirk.

Di hejmareke derbasbûyî de, derheqê jiyana şehîdê nemir Mazlum de, bi dayîka Kabîra re we hevpeyvînek kiribû. Ev hevpeyvîn bala pîrr kesên welatparêz kişand. Daxwaza min ew e ku pîrranî hûn li ser hevpeyvîna bi dayîkê şehîdan re bisekinin.

Bi bêkarên li metropolê Stenbolê re jî hevpeyvîn bikin û ji jiyana wan xeber bidin.

Firat Direncan

Em hînî Kurdî bûn

Ez gelek silav li hemû xebatkarên rojnâmeya Welat dikim.

Ji ber ku ez hînî xwendin û nivîsandina Kurdî bûme, ez çavê xebatkar û kedkarê rojnâmeya Welat, Yemî Ülke, Özgür Gündem û kovara me Ö.Halk maçî dikim.

Ji roja Welat derketiye û heta îro em her hefteyê distînin, bi kêf û gelek bi serbilindî em Welat dixwînin. Kirîna Welat bi Apê Musa re hîn bêtir xweştir bû, lê ez dibêjim, çinara welat û şehîdên welat namîrin. Ew gul û beybûn in, xortê Kurdistan in. Ez di şûna xwe û çar zarokên xwe de soz didim ku heya di lopek xwîn di rehên me de hebe, wê ala Apê Musa û şehîdên me li dar keve, bila cerdevan û hizb-î şeytan bizanîbin.

Xebatkarên Welat, ji hejmarên

rojnâmeya Welat, çend heb hejmarê min kêma in, ku hûn karibin ezê pîrr kêfxweş bibim. Hejmarên kêma in: 8, 9, 11, 13, 14, 15, 18 û 21 in. Ez ferhengoka Welat dikim pirtûk û Welat dikim arşiv. Ev hejmarên min kêma in. Hûnê bîjin çima kêma in, ez ji bo ku di girtîgehê de me, ev hejmar kêma in. Li girtîgehê jî me re nedanînin, min pere didane wan, digotin rojnâmeyekê wilo tune ye. Em ji wê tarîxê nû hatibûn. Em niha Welat rehet distînin. Ez dîsa di nav têkoşinê de silavên germ li wê û hemû xebatkarên dikim ku kêmasiyên min hebin hûn ji kerema xwe temam bikin. Spas

Hüseyin Akmeşe
Girtîgeha Kemalpaşa / İzmir

Porzerên Ewrûpî û mêrên Kurd

Ez xwendevanê welat im. Min nivîsa Bêrîvana Dêrsimî ya bi navê "Rewşa mêrên Kurd li Ewrûpa" di hejmara 46. xwend. Ez ji dil û can heval Bêrîvan pîroz bahi dikim ku berahî û rastiya wira nivîsî. Ez jineke Kurd im û çar zarokên min hene. Ev şeş sal e ku ez bi mêrê xwe re hatime Ewrûpa. Mêrê min li welat mirovêkî pîrr bi şexsiyet û têkoşer bû. Piştî ku hate vir di demeke kin de xwe winda kir. Ji xwe re yeka porzer dît. Dev ji me berda. Tenê hefteyê carekê serî li me dixist. Piştî demeke dirêj qezayeke trafîqê derbas kir û milê wî şikiya.

Piştî vê bûyerê porzera wî, ew terk kir û li me fetilî. Min ew ji ber ku zarokên me bê bav mezin nebin qebûl kir. Pê re tu têkiliyên me yên jin û mêrîti nîn e. Li vê derê pîrraniya zilamên me, ji vê rewşa kambax para xwe distînin.

Ez dixwazim taliyê vê yekê bibêjim. Li vir dema zilamên me -bi pîrranî- porzeran, pereyan dibînin tafilê xwe derdixin mazotê, -porzerên vira bê mêr mane- wan difilitînin. Welatê xwe qet nafikirin.

Ez dixwazim nivîskarên Welat xwarî ser vê mijarê bibin.

Bimînin di xweşiyê de
Dîdar/ Fransa

Alternatîva rêveberiya taybetî: Rêveberiya Waliyan

Navenda Nûçeyan- Wezirê Karê Hundirîn İsmet Sezgin, alternatîva rêveberiya taybetî dît! Li gor beyanên İsmet Sezgin, di qanûnê rêveberiya bajaran de, hin guherîn tene çêkirin û li navçeyan raye (selehiyet)ya qeymeqaman û li bajaran jî, yê waliyan zêde dibin. Wekî din, qanûnê rayeya polîsan û raye û peywîr (wezîfa) a cendirmeyan jî tê guhertin. Armanca van sererastkirinan jî, bihêzkerina rêveberiyên bajaran e. Li gor qanûnê nû, hemû peywîrên rêveberiya taybetî, dewrî waliyan dibe û bi vî awayî jî, ji vî sistemê re alternatîvek tê amadekirin.

Ev beyana İsmet Sezgin, li Tirkiyê dengê hin kom û komeyên bilînd kir. Li gor hin sazgehên demokratîk, dewlet bi vî awayî dixwaze sistema rêveberiya taybetî li hemû Tirkiyê belav bike.

Li gor beyana İsmet Sezgin, de

ev guherîn bêne çêkirin:


- Serleşkeriya cendirmeyan ê bajaran bi rêveberiya mulkî (walî) ve tê girêdan.

- Dê tayîna serbaz (subay), serbazêbin (astsubay) û cendirmeyên pîspor, bi daxwaza serleşkeriya giştî, ji aliyê wezaretê karê hundirîn ve bê kirin. Dê di tayînkirina serleşkerê cendirmeyên bajaran de, dîtina walî bê girtin. Wekî din, dê cihê xebata cendirmeyên pîspor, serbaz û bînserbazan, ji alî walî ve bê tesbîtkirin. Walî, dê dikaribe cihê xebata wan jî biguhere.

- Dê di warê dîsîplînê de, walî bikaribe ceza bide serbaz, bînserbaz û cendirmeyan.

- Dê walî û qeymeqam bikarin ji ber peywîra wan serbaz, bînserbaz û cendirmeyên pîspor ji kar biavêjin.

- Wezaretê karê hundirîn û wa-



İsmet Sezgin

lî, dê bikaribin cendirmeyan teftîş û kontrol bikin.

- İzinstandina van peywîrdaran jî, dê di destê walî û qeymeqaman de be.

Li gor qanûnê nû, raye û peywîra polîsan jî, ji nû ve tê tesbîtkirin û saziya polîsiyê jî, li gor şertên nû tê guhertin.

MKM li Amedê şûbe vekir

Amed, Welat- MKM'ê şaxa xwe ya Amedê bi beşdarbûneke pirr mezin vekir. Ev nêzi 9 mehan e ku ji bo vekirina MKM'ê li Amedê xebat hebûn. Belê ji ber çend astengan venedibûn, yek jê; tevliheviya rewşa Amedê bû û yek jê jî, aborî bû. Ev herdu şert jî, ji bo avahiyên Kurdan, gelek caran astengiyên girîng derdixin holê.

Lê rewşa gelê Kurd ku îro di nav de ye, tu astengan nas nake û yeko yeko di ser wan re derbas dibe û avahiyên xwe yê pêşerojê ji niha ve ava dike.

Ji bo vekirina MKM'ê (NÇM-

Navenda Çanda Mezopotamya) Endamê Rêveberina MKM a Stenbolê İbrahim Gürbüz, alikarê serokê belediya Amedê A.Rahman Yıldırım, rojnamevan, sendikayên li Amedê, mamoste, suxte xwendevan û gel beşdarî vebûnê bûn. Di axaftina vebûnê de İ.Gürbüz, wiha digot: "Çand hebûna miletekî ye. Ger em bixwazin hebûna xwe xurt bikin, divê em çanda xwe jî, xurt bikin. Ê ku îro gelê Kurd li ser piya hiştiye çanda Kurdî ye. Ev çand ku, bîngeha pirrî çandan, çanda Mezopotamya ye. Emê bi çanda xwe û bi têkoşîna xwe her tim hebîn." Li

pey axaftina İ.Gürbüz, A.Alokmen jî, bi Kurdî ji mêvanan re peyivî û wiha got, "MKM li dijî talankirina çanda gelê Kurd hatiye avakirin. Ji bo ku çanda gelê Kurd bide gelê Kurd û bi çanda xwe alikariya bîngeha biratiya gelên dinê bike."

Piştî axaftinan, mesajên ku ji herêmên welêt û avahiyên demokratîk hatibûn, hatin xwendin. Gelek kes û avahiyan jî, nêzi 30 çelengî şandibûn.

Vebûn bi rewşeke xweş, bi tiliyan û bi çepikan, bêyî astengekê, bi mizgîna pêşerojê rohnî qediya.

19 Mayıs bi navê Dündar Çelebi-oğlu (25) mirovek ji alî hizb-î kontra ve hate kuştin. Dündar Çelebi-oğlu gava hate kuştin diçû karê xwe yê TPAO'yê. Bi Çelebi-oğlu re Ahmet Ulutepe (23) jî birindar bû.

5 Çile 1993: Li Diyarbekir, li tanga Derêruhayê gerilayên bajêr, êrişî ser erebeyê serwisê ya leşkeran kirin. Kurê subayekî jî birindar bû. Li Bedlisê li navçeya Tetwanê gerilayan mamosteyê gundê Yassıca, Malis Şişman jî ber ku bi leşkeran re diçû operasyonan, bi direkê dibistanê ve daleqandin û kuştin.

6 Çile 1993: Li navçeya Qoserê (Kızıltepe) li ser rîya E-5 gerilayan serokekî hizb-î kontrayan kuşt. Li Nisêbinê welatparêz Emin Deniz jî alî hizb-î kontrayan ve hat qetilkirin. Li navçeya Qoserê li taxa Atatürk, welatparêz Cemil Çakır jî alî hizb-î kontrayan ve hate kuştin.

7 Çile 1993: Li Batmanê li taxa İprexazê welatparêz Hasan Kaya jî alî hizb-î kontrayan ve hate qetilkirin. Li Farqînê li taxa Feridonê hizb-î kontrayan erebeyekê gullebaran kirin. Ji kesên ku di erebeyê de bûn Ercan Us mir, 3 kes jî birindar bûn. Hêzên dewletê li Mazrayê êrişî ser gundê Bayirközü kirin. Muxtar û 6 gundî xistin binçav.

Bûyerên hefteyî

Navenda Nûçeyan- 1 Çile 1993: Li bajarê Mersinê, li taxa Selçuqlar cerdevanekî kevin ji alî hêzên gerîla ve hate gullebaran kirin. Di vî bûyerê de cerdevan Bedirhan Çelik (60) birindar ket. Ji alî hêzên gerîla ve li bajarê Diyarbekir polîsek hate kuştin û jina wî jî birindar bû. Ev bûyer li taxa Bağlar saet di 17.00 de gava polis û jina xwe ji malê derketin qewimî. Li Hezexê (İdil) jî bo protestokirina terora cerdevanên gundê dora Hezexê, esnafan kepenkê xwe 2 rojan girtin. Di vî bûyerê de, ji 100'î zêdetir dikandar û Serokê Navçeya Hezexê yê HEP'ê Yusuf Adıbelli hatin girtin. Li Batmanê li taxa Cumhuriyetê, li kuşa 1501'ê mirovek bi navê Fadil Dal (37) ji alî kesên nenas ve hate kuştin. Der heqê sedema vî bûyerê de tu nûçe ne gihîştê me. Li Diyarbekir li dervayê Hezroyê di livbaziyeke navbera hêzên PKK û dewletê de 2 gerîla bi mirîti û 2 gerîla jî bi saxîti girtina wan hate gotin. Li Silopî jî di şerekî de kuştina gerilayekî hate gotin.

3 Çile 1993: Li Geliyê Qesrik 2 birayê cotkar li ber cot, ji alî heli-

koptereke leşkerî ve hatin gullebaran kirin. Di vî bûyerê de Reşit Kalkan (17) hate kuştin û birayê wî Mecit Kalkan (10) bi giranî birindar bû. Li Nisêbinê li taxa Şeyhreşit li ser kolana Sakaya kur û bav di berkar de, li ber mala xwe ji alî hizb-î kontra ve hatin gullebaran kirin. Di bûyerê de Abdullah Kardeş mir, Azadî Kardeş bi birindarî rakirin nexweşxaneyê Nisêbinê. Li gundekî Qoserê (Kızıltepe), li mezra Herzem, gundiyeke bi navê Mehmet Salih Aksoy (20) dema ji mala xwe derdikeve ji aliyê hêzên dewletê ve tê gullebaran kirin. Di bûyerê de M. Salih Aksoy mir. Li ser teqîna çekan, apê M. Salih, Şeyh Davut Aksoy (58) bi derketina xweyî derve re ew jî hate gullebaran kirin û birindar bûn. Li Batmanê, li taxa Pazaryeri bi navê Yusuf Gür (35) mirovek kuştî hate dîtin. Sedema kuştina Yusuf Gür nehat fêmkirin. Li gundekî Misircê (Kurtalan) li Oyacık, istasyona TRT'ê ji alî gerilayên ARGK'ê ve hate texribkirin. Ji ber vî yekê li dora Misircê televizyon (TV) nayin temaşekirin.

4 Çile 1993: Li Batmanê li taxa

HAWAR

Dilbixwîn

Filmê "Mem û Zîn"ê

Di bin navê "Mem û Zîn, Felsefeya Ehmedê Xanî" de ev du-sê meh in ez bi nivîsandina pirtûkeke lêkolingerî re mijûl im. Ji bo ku bikaribim felsefeya Şêx Ehmedê Xanî binim ziman û şîrove bikim, min gelek jêder û çavkanî ji hinek pirtûkxane û arşivan bi dest xwe ve anîne.

Felsefeya Ehmedê xanî, deryayeke kûr e. Her ku mirov pê ve diçe, rastî tiştine nû tê. Ji lew re ez car-carandifikirim û dibêjim: Gelo, vî filozofî çawa ev destan nivîsandiyê? Çawa jî, Kurdan qedr û qîmetek nedane wî û li pend û şîretên wî guhdarî nekirine? Gelo hebe ku di nava Kurdan de şehrezayekî wisan zanyar, hoşeng û hozanvan were afirandin?...

Mem û Zîn, ji hemû aliyan ve di bin çavên min de ye. Wê ji aliyê evîndarî, civakî, exlaqî, dînî, tesewîfî, terminolojî, etnografî... û Kurdperwerî ve dinirxînim, li dawiyê ez tê derdixim ku, Mem û Zîn beramberî Odêsaya Homeros e.

Vê dema dawiyê bi navê Mem û Zînê filmek derkete holê. Ez li mala welatparêzekî rastî wî filmê hatim. Min bi balkêşî du caran li filmê temaşê kir.

Berî ku ez derbasî naveroka wê bibim, dixwazim bibêjim ku, di bin navê çî tiştî de di-

be bila bibe heqê tu kesî tune ye ku bi Mem û Zînê bilîze. Di filmê de eger nav lê bibe film- çend xalên bîngehî hene, girîng e mirov bi dorfirehî li ser bisekine, lê ji ber tengahiya çî ez bi kurtî wiha dibêjim:

1- Dipirsim: Gelo tu caran mirovekî Tirk dikare nivîsa Erebi bi tîpên Tirkî bixwîne û weke ku tê xwestin lêv bike? Eger bikaribe hingê em dikarin bibêjin ku rexne li ser senaryoya filmê (ya bi Kurdî) tune ne. Lê hema ew kesên ku di filmê de nivîsa Kurdî (dialog) bi tîpên Tirkî xwendine pêşî û paşîya gotinan ji hev nekirine der. Di bin navê dublajê de destûra tu kesî nîn e ku bi zimanê me bilîzin. Ez nizanîm, ev cure kes çawa cesaret dikin ku bi destaneke wiha bilind û berz bilîzin, gelo ji dîrokê jî natirsin?

2- Min Memê Alan a folklorî jî, Mem û Zîna Ehmedê Xanî jî bi baldan, xwendine. Hezkerina di navbera Mem û Zîn a filmê de ne wekî Mem û Zîna Xanî, ne jî weke ya folklorî ye. Gelo tenê navê Mem û Zînê li ber guhê rejîsor û senarîst ketibe? Gelekî mixabin ku şehîdê nemir Musa Anter jî, ajotîna nava wî girecira xwe.

3- Ji bo dramayê weke Mem û Zînê muzîkeke taybetî ku bikaribe bi serê xwe temaşgehê bide ber çavan pêwîst e. Bi hêla hêlan muzîk jî bo filman çênabin. Ne muzîk û ne jî gotin, hesta mirov bi ser xwe de nakişînin. Li gor stranên di qasêtên vî dawiyê daketine bazaran çêkirine.

4- Makyaj, montaj, qamera, senaryo, diyalog, ronahî, deng, tîkiliyên di navbera leyistkivanan de û hemû aliyan teknîkî gelekî qels in. Tiştê xweş û baş tenê ew e ku li ser axa Kurdistanê kişandine, eger ev jî tunebûya, ez dikarim bibêjim tiştêk navê wî tune bû bi filmê Mem û Zîn.

Li dawiyê:

Eger hûn nizanin ji kerama xwe re hîn bibin. Eger hûn xwe di ser hînbûnê re jî dibînin, di cihê xwe de bisekinin û bi kelepura me nelîzin. Ev leyistika ku dijmîn aniyê serê me besî sedan şalan e. Ji kerama xwe re nebin bar, barê li ser milê me giran e. Ji bo berjewendiya (meslehet) xwe ya kesanî çand, torê hozanvan û şehrezayan me nekin qurban...

Kurdistana Balkan: Bosna-Hersek

Kurteđiroka Yûgoslavya

-Yûgoslavya ji sala 1915 an heta 1928'an bi navê welatê Yûgoslavî dihat naskirin û ji sê neteweyan pêk dihat (Sîrb- Xîrvat- Slovên).

-Ji 1928'an hetanî 1941'i bi navê Yûgoslavya mîletekî dihat naskirin "ya sê mîletan".

-Di 1943'an de Yûgoslavya bi Serokatiya Tito bû Komara Sosyalîst Federala Yûgoslav.

-Ji 1941-1945 Yûg. ket şerê cîhanê yê duyemîn û di 9 ê Gulana de 1945'an bi ser ket û leşkerê Nazi ji xaka xwe qewitand (Roja Serxwebûnê).

-Di 1970'yî de musulman di Yûgoslavya de wek netewe hatin naskirin û ev cara yekemîn bû di dîroka herêmê de ku musulman dibin netewe.

-Li Yûgoslavya berê şeş Komar û du otonomî hebûn.

-Roja îro pênc komar, serbixwe ne û Bosna-Hersek di şer de ye û herdu otonomî di nav Komara Sîrbî de ne.

-Komara Sîrbîstanê û Komara Çiyayê Reş bi hev re di federasyonekê de ne û navê Yûgoslavya li xwe di-kin.



Rewşa Bosna-Hersekê pîrr tevlihev e. Ji ber ku împeryalizm, bi navê Neteweyên Yekbûyî bi çarenûsa wan dilîze. Di wêne de, musulmanekî Boşnak, ji aliyê milîsekî Sîrp ve tê kuştin.

Merdo Bêkes

Şerê ku li Bosna Hersekê dibe, ev şeş meh in dom dîke. Du sedemên girîng hene di vî şerî de û bi kurtî jî ev sedem:

I. Propaganda Tirkîyê ku wek tê dîtin û bihîstin xwe kiriyê bavê "Bosna-Hersekê" û dil şewatê ser mîletê wê û gelek guftûgoya û danûstandina li ser çêdike û xwe bi xwîna wî mîletê Bosna-Hersek wek rejîmeke mirovparêz û demokrat dîke berçavkirin. Lê bersiva vê pîrsê jî pîrr rehet e, ew jî, ji ber du tiştan e:

1) Ji bo dîrxistina awîra gelemperî ya cîhanê li ser bûyerên ku li Tirkîyê û li Kurdistanê dibin û şerê xwe yê fahşî li hember gelê Kurd û rewşa xwe ya qels a hember gerîlayên azadiyê veşêre û di vî xalê de jî, heta dawiyê hêzên împeryalist pê re hevkar in."

2) Ji bo jî împeryalê re bide xuyakirin ku Tirkîyê peywanya "Haristya" berjewendiyên wê dîke û pariyê nanê xwe yê zîwa di rûnê wê dake (Bazara Ewropî- Alîkariyên aborî û hwd.) Û bi rê de jî, xwe bide berçavkirin wek hêzek leşkerî ya xurt ji welatên derdorên xwe re...

II. Nêzîkbûn û wekhevbûna rewşa welatê Bosna-

Hersek û Kurdistanê di gelek xalan de digihe hev, nexasim başûrê Kurdistanê. Piştî hatina 'Gorbaçov' û hilweşandina Şovyetê û rejîmên komunist yê kevin, parçebûn û hilweşandina Yûgoslavyayê dest pê kir û împeryalizmê destê xwe dirêjî nav mîletê Yûgoslavya kir, ji bo berjewendiyên aborî.. Ev yek.

A duduya; ji bo dawîya komunîzmê bînc û li ser kaviên wê hinek welat û rejîman çêke û dîrekt bi xwe ve girê bide.

Lê tiştê derket holê ne wek daxwazên împeryalizmê hat "wek li Iraqê û Kurdistanê piştî reva fahşiya Seddam". Li Bosna-Hersekê di 1990-91'yî de hîlbijartin çêbûn û musulman tê de bi serketin (Hejmarra musulmana di Bosna-Hersek de %43.7 ya Sîrba %31.3, ya Xîrvata %17.3 û neteweyê kêm %5.5 e)

Di vir de welatên Ewropaya Rojava û Amerika nexwestin ku welatekî îslamî di dilê Ewropaya de çêbibe (naxwazin ku Kurdistanê di dilê Rojhilata Navîn de jî çêbibe). Di pêşveçûna van bûyeran de, Komarên Yûgoslavî parçebûn û her komareke wan ket bin bandûra partiyeke nijadperest an radîkalên hişk û bi çavê dijminan li hevûdu nêrîn û çavê xwe berdan perçenan ji welatê hev.

Ji ber karakterê etnîkî yê Bosna-Hersekê, Sîrban û Xîrvatan çavê xwe berdan parçebûna wê û bi vî awayî ev şerê bêdawî dest pê kir. Serokên musulman baweriyeke mezîna bi împeryalizmê anîn ku welatê wan ji wan re xelas bike "wek çawa serokên Kurdistanê başûr xwe avêtin hembêza împeryalizmê" û tu hêza xwe nedan ser gelê xwe û xwe ji şer re organîze nekirin.

Rewşa îro pîrr tevlihev e û rewşa musulmanan pîrr belengaz e, ji ber ku împeryalizm bi navê (Neteweyên Yekbûyî û bi hevkarîya fahş ya Tirkîyê re bi çarenûsa wan dilîzin.

Ji derve ve konferans û civnan ji bo çareyekê çêdikin û di bin re her çar deriyên welatên Ewropaya Rojava vekirîne ji musulmanan re û bi sed hezaran mirov direvin û li Ewropaya belav dibin.

Tiştê "Koma mîletan" û welatên împeryalist didin musulmanan, xwarin û vexwarin e. Lê welat ji wan didizin, mînak "Rewşa başûrê Kurdistanê!"

GOTIN



Yaşar Kaya

Hikûmet çi dîke?

Piştî hîlbijartina giştî ya 1991'an hikûmeta koalîsyonê hate ser kar. Gelek ronakbîrên Kurd û Tirk, piştî xwe bi vî hikûmetê girê dabûn digotin. "Partiyên koalîsyonê demokrat in, êdî wê demokrasî bê Tirkîyê jî. Dê tevî meseleya Kurdan hemû tiştî safî bikin."

Piştî hîlbijartinê bi neh-deh rojan bi şûn ve, di rojnameya Yeni Ülke de hevpeyvîna min û Yalçın Küçük hebû. Di wê demê de min wiha gotiye: "Ji van demokrat çê nabe". Dû re, Demirel û kurê dewletê İnönü, çûne Kurdistanê û li wê derê îlan kirin ku Kurd hene, gotin, "Em vî rastiyê qebûl dikin." Wê demê me dîsa pîrs kir. "Madem wîlo ye we çima ev 70 sal in înkâr dikir?" Di bernameya (programa) wan de ji bo Kurdan tu tişt tune bû. Demirel difikirî, digot, Turgut Özal li vir û wir behsa Kurdan dîke, gelo ez çi bikim

ku ji wî zehftir bikevim çavên generalan.

Lê tiştêkî eşkere bû, ev 70 sal in Kurdan çawa îdare kiribin dê dîsa wîlo bikin. Yanî heq, hiqûq, zîman, dibistan, radyo, tv, xwendin, enstîtu di bîra wan de nîn bû. Gotin emê, bi koçberî (surgûn), bi kuştin û bi qirkirinê vî meseleyê hel bikin.

Dinya ne dinya berê ye, Kurdistan jî ne Kurdistanê berê ye. Îro dinya ji bo mafên mirovan radibin ser pê. Êdî ko-

Ne di nav SHP'ê û ne jî di nav DYP'ê de çar kes tune ne ku bi mesela Kurdistanê zanîbin û ji serokên xwe re raporekê amade bikin. Giş bê guman mane, giş ji baweriya Îttihat-Terakiyê tîn, an Tirkçî ne, an jî kemalist in. Ew bi vî serî wê çi bidin kê?

letî nemaye, herkes li dû mafê xwe ye. Fikra, weke 50 sal berê, bi ordiyê, bi top û tîngan emê hiş ji wan qir bikin, ên din jî wê bitirsîn û emê 30-40 salê din jî wiha îdare bikin, fikreke çewt e.

Di nav ronakbîrên Tirk de, hinek bi destê dewletê, hin tiştê tewş li holê belav dikin. "Emê çawa heq bidine Kurdan, nivê wan li Stenbolê, İzmirê, Enqerê rûdînen. Kurd ji me biqetin, wê ji birçîna bimirin. Em li Kurdistanê barajan çêdikin, gelek xizmet dibine wê derê. Kurd ji me biqetin, wê hevûdu bixwin"...û hwd. Ev fikrên çewt bi zanebûn tîne belavkirin. Ne di nav SHP'ê û ne jî di nav DYP'ê de çar kes tune ne ku bi mesela Kurdistanê zanîbin û ji serokên xwe re raporekê amade bikin. Giş bê guman mane, giş ji baweriya Îttihat-Terakiyê tîn, an Tirkçî ne, an jî kemalist in. Ew bi vî serî wê çi bidin kê?

Demirel û İnönü riya xwe kifş kirine. Ew jî riya qirkirinê ye. Baş e, ew mebûsên xwedêgiravî HEP'ê Partiya Keda Gel li wir çi dikin? Aqil û îzana kê dibire bila ji me re jî bibêjin. Gelê me rind dizane, tu tiştê pak nekirin, di meclîsê de wînda bûn. Gelê me Li Hezêxê (îdilê) derseke baş dane wan, êdî gel bi wan dizane.

Hê jî her tişt nebuhuriye, derbas nebûye. Dawiya kuştinê tune. Ji bo biratî û serfiraziya gelê Tirk û Kurd, vî hikûmetê tu tiştê rast nekiriye. Wê ji îro pê ve çi bikin, emê bi hev re bibînin.



Girtîgehên Tirkiyê hucreyên îşkenceyê ne

Gavan Koçer

Endamê Qomîteya Îşkenceyan a Konseya Ewropa, Nûnera Norwecê, Astrîd Noklebye Heiberg di beyana xwe ya di rojnameya Norwecê a rojane Dagbladet, ku di mezinahiya xwe de ya duyemîn e, wiha dibêje: "Girtîgehên Tirkiyê hucreyên îşkenceyê ne."

Heiberg, ku li Unîversîteya Oslo-yê Profesora Psikyatiriyê ye, ji bo bikaranîna îşkenceyan, dewleta Tirkiyê sêdardar dibe û bi zimanê dijwar wê rexne dibe. Rexnekirina Heibergê, ku Serokatiya Partiya Kevneperestan (Muhafezakar ku gelek caran hikûmetî kiriye) a Oslo-yê kiriye û di hikûmeta koalîsyonê de ji gelek dorhêlên politîkî dikîşîne.

Heiberg di rexneyên xwe de dibêje, ev sê car in ku ew çûye Tirkiyê û îşkenceyê ji nêzikî ve vekolandiye. Rapora ku amade kiriye û ji Konseya Ewropayê re şandiye, encama lêkolîn, ên ku wê û koma (heyeta) wê li Tirkiyê çêkiribûn, bû. Daxuyaniya wê ku dabû rojnameyê bi kurtî wiha bû:

"Li Tirkiyê îşkence, di girtina îfadeyan de ji polîsan re bûye weke

sîstemek.

Me rapor kir resmî. Resmîkirina raporê dide nîşan ku li dijî îşkenceyan reaksiyonên me gelekî dijwar in. Herçend resmîkirina raporê li gor Counsila Ewropayê ne rast be jî, me ew prensîb (Konsey dixwaze ku qomîte bawerî bi ew welat, ên ku qomîte tê de kar dibe, bine) neda ber çavan. Ji ber ku li Tirkiyê her diçe îşkence zêde dibe. Me der barê îşkenceyê de, berê jî Tirkiyê çend car rexne kiribû û wan jî qanûnên xwe piir kêmbê jî guhertibûn. Lê di karvaniyê (pratîk) de bi awayeke hişk û hovane îşkence tê kirin.

Darvekirina Filistinî, yanê destên mehkûman ji paş ve tîr girêdan û mehkûm bi vî awayî tîr darvekirin. Ev wilo şiklekî digire ku wek adetî xuya dibe. Şoka elektrîkê berdidin organên girtiyan. Av berdidin hucreyên wan. Girtiyan pêxwas dibin li ser camên hûr digerînin. Ji ber ku polis bikaribe girtiyan bide qisêkirinê, îşkenceyê psikolojîkî bi kar tîne ku armanc raste rast bi şexsiyeta kesên listin e. Li girtîgehên Tirkiyê, îşkence bûye adetî û cur be cur metod tê bikaranîn. Jixwe girtiyan adî û politîkî ji hey naqetînin. Polis di îfadegirtinê de tu qaîdeki jî nas nakin. Yek armanceke wan heye, ev

jî, ji kesên binçavî girtina înforsiyonê (agahî) ye.

Ev îşkence li dewleteki NATO, li Tirkiyê dibe. Îşkence ji bo dewleteke, ku dixwaze xwe bike Ewropî û bibe endamê Civata Ewropayê, problemeke gelekî mezin e."

Li ser pîrsa ku gelo hûn çawa raporên xwe belge dikin ji wiha dibêje Heiberg: "Pêwîst nîn e ku mirov ji girtiyekî bipirse ka ew hatiye îşkencekirin an na. Wê çaxê ew bi awayekî şaşmayî li te dinêre, ji ber ku îşkence tiştê vekirî (teqez) ye. Divê mirov ji wan bipirse ka ji îşkenceyê re şopek li ser maye? Polis di vî karî de bûne pispor. Metodên wilo bi kar tîne ku, di laş de şopan nahêline."

Heiberg dawîya daxuyaniya xwe bi van gotinan tîne: "Îşkence sêceki giran e û formekî paşverû ye. Ev sêc ji aliyê mirovahiyê ve jî nayê pejiirin (qebûlîkirin). Ji ber ku mirov bikaribe rê li sêcên li dijî mirovahiyê bigire, divê agahî bê belavkirin û kes û sazgehên ku vî karî dikin bîn perwerdekirin."

Ev jî dide xuyakirin ku zilm û zordariya dewleta Tirk ewqas zêde bûye êdî dostên wê, rastên (saxciyên) Ewropayê jî, li dijî kirinên wê derdikevin.

Radyoya Kurdî ya qorsan

Li Amedê çendeki ye rodyoyek bi navê "Dengê Dicle" weşanên bi Kurdî, Tirkî û Erebi dibe. Radyo weşanên xwe li ser bingeha nêrîna fermî (resmî) ya Komara Tirk bi awayeke qorsanî didomîne.

Li ser vê radyoya qorsan mebûsê HEP'ê (Partiya Keda Gel) yê Amedê Sedat Yurtdaş pirsnameyekê da meclîsa Tirk da ku Scrokwezîr Süleyman Demirel bersiv bide.

Li gorî pirsnameya mebûs Sedat Yurtdaş radyo di roja çarşemê û îne di dema saet 14-17 û 19-22 de, di pêla navîn, li ser 1,518 metreyî weşanê dibe. Tu rayedarên dewleta Tirk ger ên herêmê û ger ên din li vê radyoyê xwedî dernakevin.

Radyo bi giştî li gor nêrîn û awirên dewleta Tirk weşana xwe didomîne.

Heta radyo dev davêje tevgera PKK'ê jî. Radyo bi sê zimanan, Kurdî, Erebi û bi Tirkî propagandayên xwe dimeşîne.

Sefareta Bexdayê vedibe

Tirkiye sefareta xwe ya Bexdayê, ku di sala 1991'an de, bi destpêkirina Şerê Xelîcê re girtibû, ji nû ve vedike. Tirkiye vê biryara xwe pêşkêşî Amerîka û Îngilistanê kir. Lê ev herdu welatên împeryalist, vê biryara Tirkiyê nepejirandin. Li ser vê yekê, Tirkiye vê biryara xwe bi hin guherînan ji nû ve derbasî jiyane kir. Li gor rojnameyên Tirk dinivîsin, dê sefirê Tirk ê Bexdayê îtimatnameya xwe pêşkêşî Sedam neke.

Di politikayên Tirk ên dinyayê de, weke her carî durûtî û li ser rêçekê nesekinandin xwe diyar dikin. Tirkiye, li aliyekî li Rojhilata Navîn berdevkiya bernameyên welatên împeryalist dibe. Li gorî van bernameyan bi rêxistinên Başûr re tîkiliyan datîne, bira bi bira dide kuştin û tovên neyartiyê diçîne, li aliyekî din jî, ji tîrsa ku, dê Kurdên Başûr dewletek ava bikin, bi Sedam re tîkiliyên germ û xurt datîne.

Her cara ku dewleta Tirk dixwaze bi Sedam re hin gavan bavêje, pêşî kurê xwe yî xas Ecevit dişîne ba Sedam û bi vî awayî, listikên nû derdikevin holê. Ev çûn û hatina Ecevit jî, bi perdeya rojnamegeriyê tê veşartin.

Roj nîn e ku rojnameyên Tirk, qala peymanên di nav Eniya Kurdistanî û Tirkiyê de nekin. Divê bê zanîn ku, dewleta Tirkiyê peymanên xwe yên rasteqîn li Bexdayê îmze dibe û bi van peymanan li dû tunekirina Kurdan digere, çî li başûr, çî jî li bakur.

Pirsnameya Zübeyir Aydar

Mebûsê HEP'ê Zübeyir Aydar di 06.01.1993'an de ji bo bersiv bidin, pirsnameyekê (soru önergesi) da meclîsa Tirkiyê, TBMM'ê.

Di pirsnameya xwe de Zübeyir Aydar li ser rewşa firotinê yên rojnameyên Özgür Gündem, Yeni Ülke, Welat, Azadî, Mücadele û kovarên 2000'e Doğru, Gerçek disekine.

Di pirsnameyê de li ser êrîş û astengiyên bi taybetî li hember rojnameya Özgür Gündem, bi giştî jî li hember rojname û kovarên din tê sekinîn.

Di navbera tarîxên 10.11.1992'an û 4.1.1993'yan de li dijî belavkirina rojnameya Özgür Gündem çî kuştin, çî êrîş û çî buyerên din çêbûbin tîr zimên. Zübeyir Aydar li ser kuştina rojnamevanan disekine. Û dibêje: "Êrîş û astengiyên li ber rojnameya Özgür Gündemê ne tenê evin. Heta îro jî 219 hejmarên Özgür Gündemê, 32 hejmar hatiye komkirin û ji dozên mehke-meya bi milyonan jê re ceza tê xwestin."

Di dawîya pirsnameyê de Zübeyir Aydar wan pirsan dibe:

1. Ev êrîş û kirinên terorî yên ku me li jor rêz kir jî, ne cure-yeke terore ye.
2. Tirkiye wê kengê jî welatê ku dengên muxalîf bi zorê tîr sekinandin xelas bibe?
3. Li dijî van astengiyên ku me li jor rêz kiriye we heta îro çî tebdîr standine?
4. Li ser van êrîş, rêlibergirtin şewitandina erebeyan, lîxistin û buyerên wek kuştinan. We çî lêkolîn kiriye? Û failên van buyeran hatine dîtin û jî bo vana qet pirsariyê (soruşturma) hatiye kirin?
5. Di gelek buyeran de failên buyeran xwe weke mensubên emniyetê didin naskirin. Weke ev kes dibêjin, bera jî, ew mensubên emniyetêne?
6. Ne kifşkirina failên van buyeran fikra parastina van kesên ji alî emniyetê ve naxe serê we?
7. Piştî daxuyaniya "Operasyona Hundirîn" û vir ve, li vê herêmê rê li ber çapemeniya muxalîf hat girtin. Û hêjî roj bi roj li qadeke fireh rê li ber tê girtin. Ev rêlibergirtin parçeyek jî "Operasyona Hundirîn e?

Hin bi hin dengê karkeran bilind dibe

Navenda Nûçeyan- Di roja 6'yê meha Çileyê ya 1993'yan de karkerên ku di TKÎ (Tesisên Komerê yên Tirkiyê'yê) de dixebitîn dest bi meşên protestokirina hikûmetê kirin.

Li bajarê Stenbolê jî karkerên ku ji belediyan hatibûn avêtin ji bo protestokirina serokên belediyan xwepêşandanekê li dar xistin.

26 hezar karkerên TKÎ'yê ji demekê ve ye ji bo peymanê giştî bi rayedarên hikûmetê re di tîkiliyê de bûn. Piştî li hevrûniştin bê encam qediya, karkerên TKÎ'yê li deh cihan xwepêşandan li dar xistin. Xwepêşandan li Manisa-Soma, Kütahya-Tunçbi-

lek, Enqere-Çayirhan, Muğla-Yatahan, Erzîrom, Çorum Dodurga, Meres-Elbistan, Balıkkesir û li Bursa'yê pêk hatin.

Li van her deh deveran xwepêşandan û meş bi saetan domiyan. Nûnerên karkeran di axaftinên xwe de geş û gelemşeyên karkeran, dijiwariya mercên (şertên) xebata karkeran, xizaniya ku tê de ne û helwesta hikûmetê yên der barê karkeran da anîn ziman.

Li bajarê Stenbolê, ji ber, ji karavêtina 681 karkerên belediyan meş û xwepêşandinek çêbû. Ev karker di belediyan navçeyên bajarê Stenbolê Bağçılar, Güngören û Küçükçekmece'yê de di-

xebitîn. Nêzikî 3500 karker li ber derê Mudiriya Karê Raqijhi ya li Güngörenê meşiyên. 25 karkerên ku ji kar hatibûn derxistin ji dest bi greva birçûbûnê kirine.

Karkerên belediyan dan xuyan ku, ew bûne qurbanên serokên belediyan RP (Partiya Refah ê. Tê zanin ku RP, bi silogana "adil düzen" (sazûmana adil) baş tê naskirin. Her wiha serokên belediyan ên ji RP'ê jî bi van sloganan bi ser ketibûn.

Her çiqas gelê Tirkiyê tevî karker û karmendan ji hêla rejimê ve hatibûn tebitandin jî, êdî mercên (şertên) jiyana dijwar dibe sebebê ku karker karmend û hwd li mafê xwe bipirsîn û lê xwedî derkevin.

Surgun, penaberî û hin problemên girêdayiyê wan

Di 12.12.1992'an de, li Stokholmê li Kurdistan Centerê, semînerê hate dayin. Ev semîner jî, ji rêza semînerên YRWK'ê li Swêdê yek bû. Semîner jî aliyê Bawer Pîroz û J.Espar ve hatibû amadekirin. Bawer Pîroz, di semînerê de, jî aliyê dîrokî ve pîrsa surgunan nîrxandibû. J.Espar jî li ser surgun û penaberî û problemên girêdayiyê wan sekînbû. Ev nivîsara jorîn kurtayiya J. Espar e.

J. Espar

Dîroka Kurdan hinek jî dîroka surgunbûn û muhacirî ye. Bi gotineke din, dîrxistina Kurdan jî Kurdistanê bûye politîka dewleta Tirk a bingehîn. Dewleta Tirk û Kurd bi çî awayê tesîr li vî politîkaya han dikin, an jî tîkiliyê wan bi hevûdu re çî ne? Di warê siyasî de, dewlet kîjan metodan li dijî Kurdan bi kar tîne, ku ew welatê xwe terk bikin? Bi kurtayî piştî 1980'yî rewşa Kurdên surgunkirî çawa ne? Çî li surgunên siyasî hat? Di vî nivîsarê de, em li bersiva van pirsan bigerin.

TÊKILIYÊN SURGUNÊ BI ASÎMILASYONÊ RE...

Dewleta Tirk, ji Cumhuriyetê û bi vir ve, surgunê her tim wekî metodeke asîmilasyonê ditiye. Asîmilasyona herî xedar jî welat, bi dîrketinê dest pê dîke. Halbûku gelek caran, çaxa ku mirov jî asîmilasyonê behs dîke; dibistan, çapemenî, dezgeh û saziyên dewletê yên sivil û leşkeriyê tîn bîra mirov. Bê guman ev hemû dezgeh û saziyên asîmilasyonê ne. Û pîrraniya van tiştan, çaxa ku Kurd li ser axa xwe ne, jî aliyê dewletê ve bi sistematîk tîn bikaranîn. Lê, li Kurdistanê, jî ber ku Kurd di nav civaka xwe de ne, xusûsiyetên civakê, bive-neve Kurdan jî tesîra asîmilasyonê diparêze, an jî tesîra wê kêmîtir dîke. Lê çaxa ku Kurd jî welatê xwe dîr dîkevin, an jî tîn dîrxistin, beriya her tiştî parêzgeriya civaka xwe wîndîkin. Ew êdî li hember civakên biyanî bi serê xwe dimînin. Di civakên wekî Tirkîyê de, hemû dezgeh û saziyên civakê berê xwe didin şexsiyeta Kurdan a neteweyî. Prosesa (domana) asîmilasyonê jî vî gavê pîrr bêhtir e.

Îro herçiqas tesîra asîmilasyonê jî deh salê berê kêmîtir be jî, lê dîsan jî, jî bo Kurdekî, hemû bajar û gundên Tirkîyê, hemû mekanîzma û dezgeyên civaka Tirkîyê, mertalên asîmilasyonê ne. Kurd beriya her tiştî li Tirkîyê jî zîmanê xwe dîr dîkevin. Zîman taybetiyeke neteweyî ya herî berbiçav e. Di navbera zîman, şexsiyet û fikir de tîkiliyên xurt hene. Ji ber wî jî, dewleta dagirker berê êrişê zîman kiriyê û dîke. Civak, çaxa ku zîmanê xwe wîndî dîke, nivê şer jî wîndî kiriyê. Taybetî û xîsletên civakî yên din jî pariyek bi zîmanê ve girêdayî ne. Civaka ku xwedî li zîmanê xwe dernekeve, gelek zehmet e xwedî li taybetiyên civakî yên din derkeve. Heger em li tîkoşîna bakurê Kurdistanê binêrin vî yekê em baş dibînin.

Li bakurê Kurdistanê, tîkoşîna rizgariya neteweyî ya çekdar jî Botanê dest pê kir û jî wê derê belav bû. Ji ber çî? Çîma jî Meletê, Dilûkê (Entabê) an jî Mereşê dest pê nekîr? Çumku herêma Botan jî hemû herêmên Kurdistanê bêhtir xwediyê taybetiyên civaka Kurdan e. Ji ber ku

1. Talan û ablûkaya aborî.
2. Bikaranîna siyaseteke êrişkar û qirêj.

TALANA ABORÎ Û SURGUN

Ne sîr e ku dewleta Tirk a kolonyalist aboriya Kurdistanê tehrîb kiriyê. Ev tehrîbata han bûye sebebê xîzani, sefeleta civakî û pêşî li zanabûna civakî girtiye. Vê yekê jî temena (emrê) kolonyalistan li welatê me dirêj kiriyê. Dewlet heta îro, li Kurdistanê jî bo armancên leşkerî û talankarî rê çekirine. Bi wî awayî petrol û hebûnên Kurdistanê yên dewlemend talan kiriyê. Dewlet avahiyên niv-êskerî û aborî çekiriyê. Dewlet jî bo xwe bigihîne bazara Kurdistanê, jî bo firotina malên xwe, mecbûr maye, hin mesrefan kiriyê. Ev politîkaya kolonyalist, jiyana aborî ya Kurdistanê felc kiriyê. Xelk mecbûr maye, berê xwe daye metropolên Tirkan, bûne sebebê keda erzan. Ango dewlet hem Kurdan jî welatê wan derdixê û asîmilê dîke û hem jî keda wan bi erzanî dikire. Çenebûna sermayeya Kurdan, li Kurdistanê helbet xesaretekî mezîna a neteweyî ye. Çaxa ku sermayeya Kurdan tune be û Kurd bi xwe avahiyên xwe yên ticarî û îndustri ava nekin, xwedî li bazara xwe dernakevin, jiyana civakî û sosyal jî derbeyên mezîna dixwe. Ji aliyê din ve, tunebûna van avahiyên millî, xelkê derê produksiyonî hiştiye. Di civaka Kurdan de çîn, tebeqe û kategoriyan civakê bi awayekî zelal jî hev neqetiyane û jî ber wî jî, jî aliyê kar û

barê civakî û sosyal ve tevlihev, sersarî, tirali û hwd. bûye karaktera civakî.

SURGUNÊN SIYASÎ

Em bîr ser rewşa surgunên siyasî. Ev jî çend cure ne. Kesên ku jî 1980'yî heta 1984'an welêt jî ber sedemên siyasî hatine surgunkirin, pîrraniya wan kesan ên ku jî berî 1980'yî di tevgerên siyasî de kar kirine û bi hatina cuntaya faşîst Kurdistanê terk kirine. Pîrraniya wan kesên derketine welatên Ewropayê û beşeke gelek biçûk jî, li hin bajarên Tirkîyê bi cih bûne. Mirov dikare wan bike du beş: 1. Ên ku gund û mezrayên wan hatine şewitandin û li gund û bajarên Kurdistanê bi cih bûne 2. Ên ku jî aliyê dewletê ve bi zorê jî gund û qezayên xwe hatine derxistin û çûne Tirkîyê û bajarên wekî Antalya, İzmir, Edene, Mîrsin û hwd. bi cih bûne.

Em jî van kategoriya bi tenê li ser ên derê welêt radiwestin.

Derê welat angî Ewropa, heta salên 1960'an jî bo Kurdan fenomenekê xerîb e. Beriya 1960'an, jî bilî çend Kurdên xwendevan li Ewropa Kurd tunc ne. Kurd di salên 1960'an de dest bi hatina Ewropayê kirin û ev rewş hê jî dom dîke. Mirov bi awayekî giştî Kurdên Ewropayê jî dikare bike du beş:

1. Ji 1960'yî heta 1980'yî
 2. Ji 1980, jî heta niha.
- Ev herdu periyod bi her awayî jî hev cuda ne. Çaxa ku mirov berê xwe

bide beşa yekemîn dibîne ku, ew pîrranî jî ber sedemên aborî angî jî ber talana aborî ya Kurdistanê, mecbûr mane jî welêt derketine an jî hatine derxistin.

Ew bi pîrranî li welatên Rojavayê Ewropa bi cih bûne. Ji hemû herêmên Kurdistanê, kes di nav van de hene. Lê, jî dorhêlên wekî Mûşê, Çepekçûre, Qersê û Dêrsimê pîrrtir in. Sebebê wî jî ew e ku, di du erdhejên mezin de yanî ya Gungum (Varto) û ya Çepekçûre (Bingolê) dewletê gelek kes şandibû Ewropayê. Der û dora Dêrsimê jî, dewletê bi zanatî belav dikir.

Helbet Kurdên Ewropayê yên pêşî, wekî gelekî mîletên din hesabên Kurdan jî neçû serî û Kurd li Ewropayê man. Piştî çend salan, beşa yekemîn dest pê kirin, jin û zarokên xwe jî anîn Ewropayê. Kurd êdî li Ewropayê bi cih dibûn. Demekê bi şûn ve zarokên wan li Ewropa mezin bûn, ên ku zarokên wan tune bûn, bûn xwedî zarok û malbat. Tîkiliyên malbatan roj bi roj sax didan û malbat li Ewropayê mezin û kevin dibûn. Malbat li Ewropayê çîqas kevin dibûn vegera welêt jî ewqasî zehmet dibû. Niha êdî rastiyeke berbiçav e, ku Kurdistan rizgar bibe jî wê gelek Kurd li Ewropayê bimînin, jî ber ku nivêş siyayî li Ewropayê jî dayika xwe dibînin.

Pîrraniya Kurdên wê demê, nezan û ne siyasî bûn. Xwedî li tu xusûsiyetên civaka Kurdî dernediketî û wekî Tirkan li Ewropayê dijîyan. His û zanabûna millî li gel wan tune bû û yên ku bidin wan jî ne li meydanê bûn. Wekî ku em dizanin piştî ku şoreşa PKK'ê li bakurê welatê me dest pê kir û Kurdên Ewropayê çaxa ku bi Kurdbûna xwe hesiyên, jî bo şoreşê hem bûn alîkarê pîrralî û hem jî bûn temsilkar û parêzgerên civaka Kurdî li Ewropayê.

Li Tirkîyê çaxa ku di 1980'yî de cunta eskerî dest danî li ser hikum, wehşetê mezîna êrişî civaka Kurdî û pêşewayên wî kir. Li hember van êrişên dewletê, siyasî û welatparêzan Kurd xwe jî her çar aliyan ve, li sînoran qelibandin. Bi hezaran kes û kadroyên siyasî jî welêt derketin. Bê guman dewletê dixwest wan kesan bigire û bavêje zindanan. Lê, tecrubeyên xwe yên berê jî dizanibûn, Kurdên ku jî Kurdistanê derketine pîrraniya wan li surgunê bi axîna Kurdistanê mirin e. Dewlet bawer dikir ku aqûbeta bav û kalên wan, wê îcar bê li ser neviyên wan jî. Ji ber wî jî, bi reva 1980'yî gelek bi kîfîweş bû.

Bi wî awayî cara yekemîn li Ewropa hejmarekî gelek zêde penaberên siyasî peyda bûn. Bi hatina vî kategoriye, rewşa Kurdan li hemû Ewropayê bi awayekî radikal guherî.

Berîya her tiştî bi van surgunên dawî, du kategoriyan Kurdan li Ewropayê gihîştin hev û wan tesîr li hevûdu kirin. Jiyana siyasî ya Kurdan li Ewropa jîndar û xurt bû. Heta mirov dikare bibêje heta destpêka êrişê Tebaxê ya 1984'yî aktivîta derveyê welêt di şoreşa Kurdistanê de rolekê sereke listiye. Ji bo tevgera PKK'ê, derê welêt bû qada haziriya şoreşê, derê welêt bû çavkaniyê kadro û şervanên şoreşa welêt. Ewropa li rêxistinên din ên Kurdî nehat, jiyana wan a siyasî li Ewropa tewa bû. Îro Kurdên Ewropa jî şoreşa bakur re piştigiriyeke gelek mezin dikin.






Em niha dewlemend in, lewre ji bo me hin nîjad û millet mirin û hin kit'a jî, ji binî ve vala bûn.

Sombart

Mamê Silê ya star - 2

Biçirîne û bidirîne!



"MA BI MEŞ Û MITÎNGAN RÊ DIHELIN.?"

Berî 1970'î karker û memûr ji bo bilindkirina maş, heqên sosyal û sendîqayî li gelek bajarên meş û mitîngan çêdikin. Dîsa dewr dewra Süleyman bû. Rojnamevanan li ser van meş û mitîngan jê dipirsîn ka dîtina wî çî ye? Serokwezîr diwaxê ve pîrsê çawa çareser bike? Lê, Demirel roviyê fenek û gurê pîr e. Metodeke wî heye. Dema dikeve tengasiyê, ew bi xwe di şûna bersivê de, pîrsê ji rojnamevanan an jî ji yên guhdar û temaşevanên dike. Bersivê ji wan dixwaze. Dema bersiva wî nedîn, dîsa ew bi xwe bersiva pîrsê xwe dide. Rojnamevanan wiha jê dipirsî:

- Serokwezîrê birêz, her roj meş û mitînganê memûr û karkerên berfireh û geş dibe, dê dawî çawa be, çare çî ye?

- Ma bi meş û mitînganê rê dihelin ha? Çiqas dikarin bila bimeşin!

"EZ NAÇIM ÇANKAYAYÊ ÇANKAYA DÊ BÊ JÊR"

Rojnamevanan di berî hilbijartina 20.10.1991'ê jî S.Demirel pîrsîn.

- Wiha xuya ye, ku partiya te qezenc dike. Heger partiya te qezenc bike, gelo dê tu herî Çankayayê û wezîfeya serokwezîriyê ji Turgut Özal bigrî an na?

Demirel:

- Ez naçim Çankayayê, Çankaya dê bê jêr. Yanî ez ji Turgut Özal wezîfeyê nagirim, ez dê wî ji serokkomariyê bavêjim.

Pîştî hilbijartinê Demirel çû Çankayayê û ji bo hikûmetdanîyê wezîfeya serokwezîriyê ji Turgut Özal girt. Rojnamevan jê pîrsîn.

- Ka tu ne diçû Çankayayê û Çankaya dihate jêr û wezîfeya serokwezîriyê ji Turgut Özal nedigirtî?

Demirel:

- Vê wezîfeyê Çankayayê neda ye min, milletê daye min.

DEWLET WEKÎ ÇÜKEK E

Di propagandaya hilbijartinê de Süleyman Demirel di her axaftina xwe de, di got ku "Ez bibim serokwezîr, pêşî divê ez Turgut Özal ji serokkomariyê bavêjim. Ez serokwezîr bim, naçim Çankayayê, lê Çankaya dê bê jêr..."

Pîştî hilbijartinê dema Demirel bû serokwezîr û çû Çankayayê û wezîfeya serokwezîriyê ji Turgut Özal girt, rojnamevanan jê pîrsî:

- Serokwezîrê birêz, ka dê tu nedîçû Çankayayê, Çankaya bihatin jêr? Çi hat guhertin?

Demirel bi hêrs:

- Çankayayê vê wezîfeyê neda min, milletê da min, digot.

Çend roj berê dîsa navbera Demirel û Turgut xirab bû rojnamevanan carek din vê pîrsê ji Süleyman Demirel kirin:

- Ka te digot; "Ez serokwezîr bim, karê min ê pêşî dê avêtina Turgut Özal be." Niha ew qanûn û qeranameyên ku hikûmeta te derdixe ew îmze nake. Ji we re astengiyên derdixe. Heger rewş wiha dom bike dê ew di meqamê xwe de bimîne?

Süleyman Demirel bi ken:

- Dewlet wekî çûkek e. Serokkomar serê çûkê û hikûmet jî bask û lingên çûkê ne. Nabe mirov serê çûkê jêbike. Wê demê çûk dimire. Bask û ling jî nikarin bijîn û xebat bikin. Divê serê çûkê bijî! Geli fendiyên we fam kir an na?

"BISMILAHÎRAH-MANÎRAHÎM!"

Dewletên derdora Deryaya Reş li Stenbolê civiyan. Divê li gor protokolê Serokkomarê Tirkîyê Turgut Özal beşdarê civînê bûbûya û îmze bavêta bin protokolan. Lê Demirel nehişt Turgut Özal wek serokkomar beşdarê civîna Deryaya Reş bibe?

Bersiva Süleyman Demirel wiha bû:

- Bismillahirrahmanirrahim!

"BEQ Û REQAN BIFROŞIN HER TIŞTÎ BIFROŞIN"

Çend roj berê Süleyman Demirel di Sendîqa Karsazên Bazirganên Tirkîyê (TÜSIAD) de axaftinekê kir. Wî ji bazirgan û karsazan re (Tücar ve işadamlar) Tirk re wiha di got:

- Divê hûn giraniya xwe bidin ser îxracatê. Beq, req, kûsî mar, kêvjal, kurm, kûzik û hema we çî bi dest xist bifroşin der!...Bifroşin her tiştî bifroşin der. Em wek hikûmet li pişt we ne. Bînaenaleyh welat wiha bi pêş dikeve...

Bazirgan û karsazên temaşevan ji kenan ziko piştî bûn.

"DEMA XELK FEQÎR BE DEWLET JÎ FEQÎR E"

Çendekê berê hikûmeta Demirel meaşê karmendan (memûran) diyar kir. Li gelek bajarên karmend meş û mitîngan çêkirin. Ji bo hindikbûna meaşên xwe hikûmeta Demirel protesto kirin. Li ser vê bûyerê Demirel derkete televizyonê û got:

- Dema hûn feqîr bin dewlet jî feqîr e!

"MA BAVÊ MIROV DIBE DIJMINÊ MIROV?"

Süleyman Demirel di axftineke xwe ya hilbijartina belediyan a dawî de, ji xelkê dipirsî:

- Ma hûn ji min re nabêjin "baba".

Xelk diçûriya:

Baba, baba, baba....

Demirel dîsa bi qîrîn ji xelkê dipirsîya:

- Ma bavê mirov dikare bibê dijminê mirov?

Xelk diçûriya:

- Naaaa...naaaaa!

Amadekar: Amed Tigrîs

TÎR

Musa Anter



Ayet ji Silêman Demirel

Silêman Demirel dibêje, "Gerek e em û dewletên dinyayê alîkariya milletên di bin zilmê de bikin. Xwesteka me ev e." Lê îca berî niha bi du rojan, yanî di 20'ê Gulana 1992 an de Mesut Yılmaz ji Silêman Demirel re digot: "Silêman Demirel wek ordekeke şaş e." Di edebiyata Tirkîyê de, ordeka şaş ew e ku lê teng bibe dixebite ku bi qûnê xwe têxe bin avê. Wê çaxê jî miradê wê nabe. Ordekê divê bi serî xwe têxe avê.

Silêmanê muhterem tu dibêji li Tirkîyê milletê Kurd heye û tu dibînî bê hikûmeta te çiqasî zilm û wehşiyetiyê li vî milletî dike û em jî zanin û dinya jî zane ku ev wehşet bi emir û devê te ye. Îcar tê bi van pîrsên derewîn kê bixapîni. Birako me hevûdu nas kiriye, bê çawa di nexweşiyekê de esas ew e ku nexweşî teşxîs bibe yanî bê naskirin, di hereketa miletan de jî ya pêşiyê ew e ku mirov dost û dijminên xwe ji hev nas bike. Êdî ji nexweşiyê re derman û ji milletan re jî çareya rihet dimîne. Yeşîn bike Silêman Beg, me Kurdan tu qenc fêhm kiriye. Ez dibêim qenc, ne ku tu qenc î, ez dibêim em qenc zanin ku serekê dijminên Kurdan tu yî.

Di temamê kitêbên muqedes de, di Incîl, Tewrat, Zebûr û Quranê de nalet li yecûc û mecûcan dibe. Pêxemberê Çînê Konfîçyûs jî, di vî fikrê de ye. Tu jî û temamê dinyayê jî, zanin ku yecûc û mecûc qewmê Asya Navîn in, yanî Moxol in, Tatar in, Oxuz in, Kirkiz in, Taçîk in, û yê din in. Em dinêrin tu bi wî qafê xwe yê mezin lê dixî diherî ber lingên van yecûc û mecûcan. Û tu bi wan iffîxar dikî. Ev bîst carî te gotiye ji Behra Adriyatîkê heta Behra Çînê elhemdulillah bûn dewletên Tirk. Em ji vê re nabên tiştek, em hevalbendên temamê milletên dîl in. Yecûc mecûc, bila kitêbên muqedes wan wek şeytan jî qebûl bike, lê em Kurd dixweş in ku ew jî bibin xwediye ax, welat, namûs û şerêfa xwe.

De îca Silêman bi wê devê xwe yê pehn û bi wan diranên Ispartayî kirizî, tu zanî tu dibêji çî? Tu zanî, lê de ka ez ya te bêjim: "Li Rojhilata Navîn, li temamê dinyayê ez qebûl nakim ku dewleteke Kurd çêbibe." Ne te fêhm kir bê çima em ji te re dibên dijmin. Ma dikeve serê te Amedî, Mêrdînî, Ruhayî, Wanî, Bedlîsî û temamê wilayetên Kurdistanê bibin hêsiyên mihacîrên Isparta?

Tembîha min li te be, ji qewlê we ve sayin "Baba", wileh ez nizanîm tu çî baba yî, ji ber ku tu ocaxkor î, zaryên te tune ne, ez dibêjim hema milletê te bi heqî jî henekên xwe bi te dikin. Ma ku te zanîba bavîti çî ye û kezêba bavîtiyê bi te re hebûna tu dibûyê sebebê kuştina ewqas lawên Kurd û Tirk. Îca ew cewher bi te re tune ye wek artistekî sehnê ku carna rolên bavîtiyê dilîze, tu jî niha li Tirkîyê wiha yî. Wek Kelhesen, Komîk Naşî û İsmail Dumbîlî.

Ma ku ne wiha bûna ev îş dihatin serê me, lê tu jî ne neheq î. Ma ku ne em pûşt û bêez bûna me ray dida te û me te ji xwe re dikir serokwezîr? Ez dibêim hema tu çî ji me bikî heqê te ye. Ez ji xapînokên Tirkan re tiştekî nabêjim, lê ev Kurdên ku bi te re fermana Kurdistanê radikin û xwîna xortên Kurdan bi te re dialêsin ez li wan dimînin ecêbmayî. Nalet li tevî tebîetê te-û mebusên Kurd ên li dora te be.

23.5.1992

Li Kurdistanê malan dişewitînin, xelk koç dike

Gund vala dibin

Dewlet, bi navê harekata hundirîn, li Kurdistanê gundan vala dike. Ev politikayên kolonyalist gundiyan Kurd, ji erd û warên wan, qut dike. Gundî li navçe û navendan kom dibin. Bajâr wek barûdê li benda çirûskekê ne.

Navenda Nûçeyan- Ji bûyerên Newrozê û vir ve Komara Tirk mebesta xwe bi awayekî pendî (eşkere) da nişan ku ew ji talankirin, wêrankirina gund û bajarên Kurdistanê ye. Demekê bi vê mebestê herêma Botanê jî wêrankirin, şewitandin, malan hilweşandin û xwestin herêmê ji mirovan vala bikin. Lê gel li ber xwe dabû. Nehişt mebest û armanca dewleta dagirker here serî.

Niha jî hêzên dewletê bi navê

“operasyona hundirîn” gundan bi carekê ji binî ve dişewitînin, navçeyan vala dikin. Bi êrişên gelek xedar diçin ser gund û navçeyên Kurdistanê. Gel bêgav (mecbûr) dimîne dest bi koçê dike.

Ji qezaya Hîlalê ku girêdayî navçeya Qilaban (Uludere) a Şirnexê ye gel ji ber pêkutî, xedr û zilma hêzên dagirker û caşan (çeteyên gundan) koçber dibin. Hêzên dagirker tevî caşan cerdî ser malan dikin, mirovan dikujin,

dan û dû, qûtên wan berî nava hev didin, agir berî malan didin, bombeyan davêjin dukanan. Bi vî awayî terorê, li ser wan dimeşînin da ku gel dev ji mal û mulkên xwe berde, herêmê bişewirîne (terk bike). Ji ber van kirinan 20 malbat ji Hîlalê malên xwe bar kirin. Hin jî li ber barkirinê ne.

Ji Hîlalê Abdullah Kara (60) wiha dipeyive li ser rewşa herêmê: “Bombe avêtin mala min. Du zarokên min mirin. Yek; yek salî, yê din jî du salî bû. Sê kes jî birîndar bûn. Dû re dukana min şewitandin. Her tiştê min jixwe dukana min bû. Ji bo herdu bûyeran jî min serî li meqamên fermî (resmî) dan tu tiştê min bi dest ne-xist. Xwedêgiravî dema di bin çav

de 24 saet e, lê du lêzimên min hatin girtin hê jî me hay ji wan nîn e. Navên wan Abdullah û Îsmail Kara ne.”

Ji milê din ve jî hêzên dewletê gundên welatparêz û yên ku çeka dijîminî danîne, ew xistine hesarê.

Gundên ku girêdayî Şirnexê ne (nêzikî Geliyê Qesrikê) jî aliyê hêzên mêtîngehkarên ve tahde, pêkutî û teroreke mezin li wan tê kirin. Derketin û ketina gundan di bin kontrolê de ye. Gundî nikarin derkevin navçe û bajêr da ku ji xwe re qût û lazmatiyên xwe temîn bikin. Ev gund ji ber kirinên dewleta dagirker hatine ber sînoren birçibûnê.

Gundên ku di hesara (çemberê) hêzên leşkerî yên dewletê

de ne Dêrşev, Meydîn, Qarnê, Şerefi, Deştadalê, Basrêt û Orê ne. Gundê Reşenê jî ber ku şênîyên we caşîtiyê dikin ku ew jî di nava wan gundan de ye û girêdayî Duhê (Eruh) ye bi firokan (helikopteran) jî wan re qût û lazmatiyên wan ji hêla dewleta dagirker ve tê temînkirin. Gund jî, ji hêla leşkerên Romê ve tê parastin. Li dora gund jî mayîn hatine dayîn. Gundên ku di hesara dewletê de ne, ku ji gundên xwe derkevin divê di gundê Reşenê de herin.

Hêzên leşkerî yên dagirker bi mebesta ku gundî, qût û lazmatiyên ne ji bo xwe lê ji bo PKK'ê temîn dikin ew gundan xistine hesarê.

Divê ev kirinên hovane yên Komara Tirk baş bûn zanîn ku, ev jî şerê psikolojîk tî. Ango ev kirin parçeyên şerê gemarî ne û bi navê, “operasyona hundirîn” tî kirin. Ma jixwe Serokkomarê Tirkiyê Turgut Özal bi pendî û eşkere nabêje, “Divê gundên çiya bi carekî bêne valakirin. Da ku PKK'ê nikaribe xwe li çiyê bigire.”

Car caran rayedarên dewleta çavsor daxuyaniyan didin û ev kirinên ku ji aliyê leşkerên Roma teres ve tî kirin, red dikin û dibêjin, “Em bi metodên Kuyucu Murat Paşa naxwazin vî meseleyê hel bikin. Em vî meseleyê dixwazin çarçoveya demokrasîyê de çareser bikin.” Ev gotinên Serokwezîr Demirel bi xwe ne.

Divê ev yek û daxuyaniyên wan baş bûn zanîn ku tu tiştê jî metodên wan neguheriye. Dev û dilên wan ne wek hev diaxivin. Jixwe bi vî awayî peyivîn, politîkaya şerê psikolojîk e.

Ma Demirel negotibû heta niha me 28 serhildanên Kurd şikand em dê ya 29. jî bişikînin. Şikandina van serhildanan bi çî rengî bûn ev kirinên niha jî çynî ne. Ango azîne û metodên dewleta dagirker û hov qet neguherîne.



Gundiyan Kurd ji ber zilma dijîminî hema çî bi destên wan bikeve malên xwe lê dikin û dikevin rîyan. Mîna kesên ku xwîn bi wan de hatiye bi lezgîni dest bi terkkirina gundên xwe dikin.

Amed germ dibe

Î.Xort

Amed- Têkoşîna rizgariya neteweyî, ji dema ku dest pê kiriye ta niha, Amedê di xeweke ne wekî navê xwe de bû (ji bilî serhildana cenazê Wedat Aydin). Têkoşîn, her ku li herêmên welêt geş dibû, ji Amedê deng dernediket, navçe, gund û bajarên Kurdistanê xera dibûn, A-

medê dîsa deng dernedixist. Di xeweke mirî de bû.

Dibe ev xew xewa tirsê bû, belkî jî ev xew, xewa ‘çî min jê ye’ bû û belkî ev xew, xewa roja giran bû! Ev xew xewa çî dibe bila bibe, bi navê Amedê nediket, ev çî bê dengî û çî tirs bû?

Amedî li xwe vegeyriyan û ji xwe pirsîn: Ma ta kengê ev bêdengî?.. Belkî yên ku ev

pirs ji Amediyan re kirin, koçerên ku nû hatin bajêr, ên ku mal û gundên wan ji hêla neyarê hov û xwînxwar ve hatibû talankirin û şewitandin bûn! Û belkî jî, namûsa wan dev ji wan neqerîya!

Amediyan zû bersiva pirsê xwe dîtin. Çiqas mirov ji neyar re serê xwe deyne, neyar ewqas li stûyê mirov siwar tê. Wê gavê em ser da-

naynin û em natirsin! Ma em ser datînin jî, me digirin, me dikujin, me talan dikin û her tiştî bi me dikin. Hema emê weke xwe bikin, bila mîraniya me ji me re bimîne!

Ji dema ku zivistan hatiye, sermayeke pîrr dijwar li Kurdistanê heye, ev 40-50 sal e ku sermayek wilo li Amedê nehatiye dîtin.

Wechê (rûçikê) mirovên Amedî, ku hem ji sermê û hem jî, ji zilm û zora neyar nexweş bû, bê ken û bê xwîn bû. Bi êrişên partîzanan, wek gula biharê vebûn, xwîn hate wechê wan û devê wan jî, kenê dît.

Zivistan sar e. Li ser erd bostek qeşa heye. Gure gura soba agir e, lê sobe mirovên Amediyan germ nake! Êrişên partîzanan, neyarê hov ê li dijî mirovahiyê dixwe quncikê wan û dilê Amediyan hênik, Amedê jî, germ dike.

Bîlanço ya şer a ARGK'ê

'Di 1992'an de 1491 bûyer qewimîn'

Navenda Nûçeyan- Ajansa nûçeyan Kurd-Ha, der barê 1992'an de bilanço ya şer weşand. Bilanço bi temami ji çavkaniyên ARGK'ê hatine girtin û bi bilanço ya ku dewleta Tirk belav kiriye re hatine muqayeskirin.

Di gel vê yekê, helwesta (tewra) dewleta Tirk, ê ji destpêka şerê çekdarî û vir ve hatiye şirovekirin û der barê şer de, derewên wan hatine eşkerakirin.

Kurd-Ha der barê bilanço ya şer ya 1992'an de wiha dinivîse: "Hejmarên ku me ji weşanên PKK'ê û ji qerargêhên ARGK'ê girtine, ji yê dewletê pirr cuda ne. Lêkolînên ku me mehekî domand, nîşan dan ku, ji destpêka 1992'an heta dawî ya salê, 1491 bûyer pêk hatîye. Ev bûyer bi giranî, rêbirrîn û cerdên ser gund û bajarên in. Ger di her bûyerê de, mirovek jî miribe, derdikeve holê ku dewlet derewan dike. Li gor lêkolîna me, di 1992'an de 1491 bûyer qewimîne. 875 cerd (baskin), 208 rêbirrîn ji alî

gerîla ve pêk hatine. Di van bûyeran de, 5594 leşker, serbaz cerdevan muxbîr hatine kuştin. Ji van kesan 118 heb serbaz, binserbaz û serekçawîş in. Ji serbazên rutbebilind (Albay, Yarbay û hwd.) 44 kes, 773 cerdevan in. 22 helikopter, 6 jî balefir hatine daxistin. Zayiatên gerîla 946 kes in. Ji bilî wan, 150 gerîla jî bi birîndarî dil ketine. Di 1992'an de, 857 livbaziyan girseyî, xwepêşandan, dikangirtin, meş, grevên birçîbûnê û hwd. pêk hatine. Di şer û cerdan de 4714 çek ji alî gerîla ve hatine bidestxistin.

Dema me ev lêkolîn kir, me li hemû belgeyên qerargêha ARGK'ê nihêrt. Wekî din, weşanên PKK'ê yê vê salê hemû ji çav derbas bûn. Serleşkeriya Qerargêha ARGK'ê dide xuyan ku, ev lêkolîna me, têrî diyarkirina şer ya rasteqîn nake, lewre gelek bûyer hene ku derbasî nivîsê nabin.

Me jî vê rastiyê dît. Di vê demê de, 28 leşker dil hatine girtin, pirraniya wan hatine azadkirin.



Di 1992'yan de 875 cerd (baskin) 208 rêbirrîn ji alî gerîla ve pêk hatin.

Di rastiyê de jî, ev bilanço hemû, barê li ser piştê gelê Tirk e. Di vî şerê bi gemar yê ku li

hember gelê Kurd tê meşandin de, ger gelê Tirk, destê gelê Kurd bi dostanî neguvêşe, dê

her tim di binê vî barî de be û dê hemû bilanço jî, ji kîsê wan û ji jiyana wan derkevin."

Mebûsên Meclîsa Neteweyî dest bi livbaziyan dikin

Navenda Nûçeyan- 15 mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistan, yê li Ewrûpa hilbijirîn, di civîna xwe ya yekemîn de, biryara greva birçîbûnê girtin. Mebûsên Meclîsa Neteweyî, ji hemû hêzên demokrat û pêşverû daxwaza piştgiyê kirin û wan vexwendiyê livbaziyan kirin.

15 mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê, ji bo vê biryarê bigihînin raya giştî, daxuyaniyekê belav kirin. Daxuyani, di destpêkê de, sedemê greva birçîbûnê şrove dike û dî re jî, daxwazan tîne ziman. Bi kurtî ev tişt hene di daxuyaniyê de:

- Dewleta Tirk, bi şerê ku nav

lêkiriye "tevgera hundirîn", li hember gelê me, bi mebesta îm-hakirinê, êrîşên nû dimeşîne. Li Kurdistanê, hemû normên hiqûqa kesani, hiqûqa neteweyî bin pê dibin. Li hember gelê sivil û bêparastin, bi dijwarî siyaseta tunekirina girseyî tê meşandin.

Em 15 mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê yê ku li Ewrûpa hilbijirîn, ji bo protestokirina kirinên li dijî mirovahiyê û şerê ku dewleta Tirk li Kurdistanê dimeşîne, di 24 Çile 1993'an de, li paytexta Belçîqa, Brukselê, dest bi greva birçîbûnê dikin.

Em jî hemû Kurdistanîyan, nijada wan, fikra wan a siyasî, rêxis-

tina ku pê ve girêdayî ne çî dibe bila bibê, yê alîkarê serxwebûn û azadiya Kurdistanê ne, daxwaza desteka aktîv dikin."

Mebûsên Meclîsa Neteweyî, di pênc xalan de, daxwazên xwe jî bi rêz kirine. Ev daxwaz, rawestandina alîkariya çekan li Tirkîyê, di şer de bi cihanina prosedura hiqûqa şer ya navneteweyî, ji alî parlamentoyên Ewrûpa, li Kurdistanê lêkolînên di cih de, ji bo daxwazên gelê Kurd ên azadî û serxwebûnê bêne cih, di qada navneteweyî de zordayîna dewleta Tirk, rawestandina şerê li hember gelê Kurd û lê rexnegirtina dewleta Tirk, ji bo kirinên wê yê

li Kurdistanê û hwd...

Mebûsên ku vê daxuyaniyê îmze kirine ev in: M.Selim Çürükkaya, Meryem Çolak, İsmail Sayan, Rifat Çelebi, Maşallah Öz-

türk, İsmail Özden, Timur Sayan, İlhan Kızıllan, Zeynep Dere, Dilçek Kurt, Robin Rewşen, Melle Mehmed, İsmail Göksungur û Metin Cansız.

Dîsa dergehê Xabûrê hate girtin

Li ber dergehê Xabûrê nêzikî 500 qamyon ji hêla rayedarên Tirkîyê ve hatine rawestandin. Rayedarên dergehê, ne dihêlin qamyon ji vî alî ve werin û ne jî dihêlin qamyon derbasî vî aliyê bibin.

Qamyonên ku ji başûrê Kurdistanê tîne bi mebesta a-nîna mazotê yê ku dixwazin erzaq bibin başûrê Kurdistanê jî, bi mebesta ku depoyên wan ên mazotê mezin in, hatine rawestandin. Qamyon ji 20'ê Kanûna 1992 an ve, ji alî rayedarên dergehê gomrikê yê Xabûrê ve tîne sekinandin.

Şofêrên qamyonan bi hemû hewldanên xwe ve tu tiştê ne ji qeymeqamê Silopî û ne jî, ji waliyê Şirnexê bi dest xistin. Şofêr bi awayekî perîşanî li ber dergeh, hem li vî alî û hem jî li wî alî disekinîn.

Meaşê cerdevanan zêde bû

Hikûmeta koalîsyonê, meaşê cerdevanan nêzikî 500 hezarî zêde kir. Dê cerdevan ji niha û pê ve nêzikî 2 milyon û 200 hezarî meaş bigirin. Dewlet bi vê zêdekirina meaşên cerdevananre, dixwaze rê li ber îstîfayên cerdevanan bigire. Weke tê zanîn, di van demên dawî de, li gelek herêman îstîfayên cerdevanan zêde bûbûn.


Armanceke dewletê yê din jî, bidestxistina mirovên bê îş û kar e. Gelek mirovên nezan hene ku ji bo pere dest bi vî karê gemarî dikin.



Mebûsên Meclîsa Neteweyî ya Kurdistanê di 24'ê Çile de li paytexta Belçîqa, Brukselê dest bi greva birçîbûnê dikin.

PÊNÛS

Amed Tigrîs



Sedemên têkçûna sosyalîzma reel

Sosyalîzm, ji bo başkirin û nêzîkbûyîna rewş û şertên wekhevîya jiyana mirovan e. Li dijî hemû rengên kedxwarî, çewsandinên (pest) çînî, neteweyî û zor-dariyê ye. Sosyalîzm, ne ji bo kar û berjewendiyên (menfe-etên) sinifeke taybetî an jî ya burokratan e. Yanî ne ji bo kesên jor e. Ne ji bo milîtan û endamên partiyê ye jî. Di bingeha xwe de, bi tenê ne ji bo çîn û qadên karkeran e jî. Rast e çîna karker û kesên xebatkar ji xwe re bingeh digire û bi wê re kar û berjewendiyên hemû çîn û qadan ji heta dereceyek di-parêze. Ji ber ku civak ne bi tenê ji çînekê pêk tê. Di her civakê de gelek çîn, qad hene. Divê sosyalîzm hemûyan hesab bike û berjewendîya tevî bide ber çavan. Yanî sosyalîzm ji bo jiyana hemû mirovan e. Ne ku hinek çîn û qadan ji navê rake û di şûna wan de hinek çîn û qadên din derbixe holê, an jî

Ma sosyalîzm ji bo çi ye? Gelo ne ji bo pêşketina mirov û civakê ye? Ne ji bo welat û cîhanê wekhev û azad e? Ne ji bo wekhevîya mafên gelan ên neteweyî û demokratîk e? Ne ji bo jiyaneke xweş, dilşa, serfiraz û pîroz e?

berjewendiyên wan biparêze. Sosyalîzma reel ku xwedî jiyaneke 70 salî bû, polîtîkayêke wiha jî neajot û bi cih neanî. Wê piştî xwe neda berjewendiyên çîna karker û xebatkarên jî. Ji derê kar û berjewendiyên çîna karker û xebatkarên, wê kar û berjewendiyên burokrat û endamên partiyê di pileya (derece) yekemîn de girt dest û parast. Li dijî xelkê, ew bû partî û sîstema van û çîn û qadên civakê. Sosyalîzma reel xwe li ser vê bingehê ava kir. Ji ber vê yekê jî, ji prensîb û bingehên sosyalîzmê dûr ket. Bi navê sosyalîzma reel ji xwe re sîstemêkê çêkir.

Ev dîtîna min, bersiva vê pirsê gelek hêsan û vekirî ye. Ên ku di jorê partiyên de cih digirin dîtîneke wan ên wiha heye. Di dema zor, giran û teng de zehmetiya vî karî me dît. Kuştin, lêdan, birçîbûn û perîşaniyê me dît. Ên derî partiyê neketin nav van zehmetiyên giran û dijwar. Ji ber vê yekê jî, heqê yên din tune. Ew dîtîna û helwestên wiha, mal û hemû hebûnên welat wek malê xwe dibînin. Ji derê wan heqê tu kesî jî tune ye. Ji ber vê yekê heqê tu kesî jî tune ye rexne li wan bigire. Ên ku rexne bikin, li gor vê bîr û baweriyê dibin ajan an jî xwefiroşên împeryalîzmê.

Ev dîtîna û helwest, otomatîk pêşî li pêşveçûna civakî û demokrasîyê jî digire.

Dergehên partî û dezgehên dewletê, ji kesên durust, kêrhatî û bi qabîliyê re jî tê girtin. Rê, ji kesên şalûz û kuşpene (yağcı) re vedibe. Partî dibe cih û hêlîna kesên xweparêz, şalûz û berejewendperest. Her kes jî, ji yê ser xwe re dest û çavên xwe digire. Di bazirganî, perwerde û hemû warî de ma- fiya çêdibe.

Berpirsiyarî tune. Malê dewletê dixwin û digevizin. Muxalefet tune. Reqabet tune. Rexne tune. Çapemenî tune. Çalaki (hereket) tune. Ji ber vê yekê civak, heta jiyana radiweste. Pûç dibe. Roj bi roj xelk ji partî û sîstemê dûr dikeve. Naxwaze bixebite. Kar û berhemên bi qalîte nake. Bîr û bawerî namîne. Xelk ji sîstem û partiyê nefret dike.

Ma sosyalîzm ji bo çi ye? Gelo ne ji bo pêşketina mirov û civakê ye? Ne ji bo welat û cîhanê wekhev û azad e? Ne ji bo wekhevîya mafên gelan ên neteweyî û demokratîk e? Ne ji bo jiyaneke xweş, dilşa, serfiraz û pîroz e?

Belê ... Belê ji bo van tiştan e! Dema ku teorî û pratîka sosyalîzmê ne ji bo van tiştan be, mirov çima sosyalîzmê bixwaze? Çima hewqas têkoşîneke dijwar bide?

Sosyalîzma reel, ji ber vê yekê wînda kir. Baş bû ku zû wînda bû. Sosyalîzma zanistî û ya reel ji hevûdu diyar û cuda bûn. Herwiha partî û kesên sosyalîst û ne sosyalîst jî, ji hevûdu diyar û cuda bûn. Sî, mij û morana sosyalîzma reel a ku ketibû ser sosyalîzma zanistî rabû. Sosyalîzma zanistî, divê dogmatîk û mekanîk nebe û xwe nû bike. Pêwistiya sosyalîzma zanistî hin jî, zêde derkeve holê. Bi taybetî, ji bo Kurd û Kurdistanê sosyalîzm pêwîst e!

Vekolanên li ser dengnasî û peyvsaziya dîrokî ya zimanê Kurdî û zaravayên wî

Prof. PIERRE LECOQ

Afîkarîkirin û wergerandina Mamo Cûmî



(2)
3- Îraniya gelemper û zaravakirina wî:

Îrannas dipejirînin ku berê zimanekî Îranî yê tenê hebûye. Koçerên Îranî (Ari, Aryan) berî ku bîna li Îranê rûnên, zimanekî wan î gelemper hebûye, mîna çawa ê Romanan Latîni hebû. Ev zimanê Îranî li herêmeke fireh belav bû û êdî zaravakirîna wî dest pê kir. Gava em niha zimanên nû dixwînin, em dikarin bibêjin ku, Kurdî û maka Kurdî di dema Akêmênîyan de dihate dengkirin, tevî ku em tu şopan nabînin. Wekî diyar e berê, koçerên Îranî ji hev fêr dikirin. Strabon (XV, 2, 8) dinivîsîne: "Navê Aryan li parçeyekî Persê û

parçeyekî Mêdya Mêdî nedipeyivîn.

Em ji Strabon têdigihên ku, Îranî ji Medan heta bi Sogdiyana bi gelemperî dikarin ji hev fêr bikirana. Ev nahêle em bifikirin ku di dema (sedsalek berî Zayîni) wî de zimanê Îranî ji hev venqetiyane. Wekî zimannas dibînin, zimanên Îranî li gor nexşên Akêmênîyan li sedê VI-an berî zayîni ji hev cuda bûne, tevî ku dîsa hev fêm kirin hebû.

4-Zimanê Mêdî:

Gava mirov nexşên Akêmênîyan dixwîne, dikare bi bawerî bibêje ku, ev gotin ne Parisiya Kevin e, Mêdî ye (Hin durvên Mêdî û Avistî li hev dikevin). Ji bo ku em Mêdî bixwînin, divê em ane-


Latîni (equus), Mêdî û Avistî (espe), Parisiya Kevin (ese), Kurdî (hesp), Farisiya Nû (esp, lê ji dema Arsasîde de girtine).

3) K't (Hind-Ewrûpî) > St(Mêdî) > St(Parisiya Kevin)

Mêdî (freşte), Avistî (frestçe), Parisiya Kevin (freste), Kurdî (xwestî). Latîni (rectus), Avistî (raşte), Parisiya Kevin (raste), Kurdî (rast).

4) G'(h) (Hind-Ewrûpî) > Z(Mêdî, Avistî) > D (Parisiya Kevin):

Latîni (gno-), Mêdî û Avistî (zan-) Parisiya Kevin (dan-), Kurdî (zan-). Latîni (ego, Avistî (Ezim), Parisiya Kevin (Edem), Kurdî û Talêşî û Peştû (ez). Almanî (berg'h-), Mêdî (Berziye-),



Medya û heta ber bi Bakur, li Bektrîyan (Belx?) û li Sogdîyan belav dibe, ji ber ku zimanên wan hema hema yek e (omogluttol) para mikron". Îrana kevin di warê rêvebirinê de parçe kiribû. Bi gotîneke dinê, wat a siyasî ya Arayan, Pers û Mêdiya ne tê de ne. Aryan ji cihê Perthan re dihate gotin. Lê gava Strabon parçeyekî Persê û Mêdya digihêne Arayan, ji bo sedemên zimanî ye. Çima parçeyekî Persê dixê? Ji ber ku li Persê Êlamît hebûn, zimanê wan ne Îranî ye. Çima parçeyekî Mêdya dixê? Ev jî dibe ku li

gorî metodekê herin, qanûnên dengnasî bixebitînin:

1) K' (Hind-Ewrûpî) > S(Mêdî, Avistî) > Th(Parisiya Kevin):

Latîni (decem), Grêkî (deka), Avistî û Mêdî (dese), Parisiya Kevin (dethe), Semnanî (dest), Perth (des), Kurdî (deh). Em gotina Mêdî ji gotina "Sîka" "qûm, lim" (Parisiya Kevin= thîka) dinasin. Wiha, li gor şopa "Isoglosses", Parisiya Kevin ji zimanên dinê yên Îranî, bi taybetî ji Mêdî, vediqete.

2) K'W (Hind-Ewrûpî) > Sp(Mêdî, Avistî) > S(Parisiya Kevin):

Parisiya Kevin (Berziye-, navê birayê Kambîs), Kurdî (berz, bilind). Sanskirîti (jreyeh-), Mêdî (zrenkê-), Parisiya Kevin (Drenke-), Kurdî (derya). Gava Êlamîtan gotîneke Îranî bi kar anîne, ji Parisî girtine û gava Babilyona gotîneke Îranî bi kar anîne, ji Medan girtine.

5) G'(h)w (Hind-Ewrûpî) > Zb(Mêdî, Avistî) > Z(Parisiya Kevin):

Mêdî û Avistî (zbeyetî-), Parisiya Kevin (hîzane), Kurdî (ziman, "b" a kevin bûye "m"), Farisî (zeban, ji Perthî hatiye).

Wê bidome

1992: Weşanên Kurdî gelek qels derketin

Rûken Baxdû

Îro rewşa weşanên bi Kurdî qet ne ronahî ye. Ev rewş ji kêm daxwaziya xwendevanan, li hember rojnameyên ku evqas bi zor û eziyet dertên û weşanên di qadên cur be cur de ku tînan weşandin diyar dibe. Heta niha herkes bi awayekî gili û gazinên xwe yê der heqê qedexetiya li ser zimanê Kurdî dihanîn zimên. Lê piştî ev qedexebûn bi qismekî, ji ser ziman rabû, ne xwendevan û ne weşanxane tîr lê xwedî derketin. Di serê 1990 an de, gava weşanxaneyan nû dest bi weşanên Kurdî kirin, pirtûkên ku diweşandin -mijara wan çî dibûn bila bibe- tevde dihatin firotin. Wê demê ji xwendevanan re, di pirtûkan de derbasbûna gotina 'Kurd' ji bo standinê bes bû. Lê di pêvajoya heta 1992 an de, insan êdî li gora başbûn û xirabûna naveroka pirtûkan ew standin. Ev hinekî jî di kesa de, encama pêşketinê hiş û zanebûna neqandinê ye. Ji ber ku hejmara weşanên bi Kurdî di sala 1992 an de derket merhaleyeke herî bilind (Ji 1989 an heta 1992 yan) lê li hember vê, firotina pirtûkan hin bi hin daket xwar. Sedemên vê rewşê ne ji deverê tenê ye. Lê ji gelek cihan û sedeman tê. Berî em van sedeman ji hev veqetînin, divê em hin tiştan bi rêz bikin. Çavkaniyek ji van sedem

man ew e ku, dewlet vê rewşê, hoyê (şertê) hebûna xwe dizane û bi temamiya hêza xwe li serê disekine.

Ku em bi bingehî li ser rawestînin, em dibînin ku sedem ne yek tenê ye. Pêşî dewlet û kirinên wê, dû re helwesta weşanxaneyan û paşî jî tîkiliyên xwendevanan.

Ev weşanên çanda Kurdî ku ewqas qels in jî, ji aliyê dewletê ve tînan civandin; kesên wan dixwînin û distînin tînan girtin, îşkencekirin û mehkûmkirin. Ji bo ev weşanên Kurdî bala raya Kurd nekişîne, dewlet bi temamê qanûnên xwe ve yênan antî-demokratîk û gelek caran jî bi bêqanûnî bi ser wan ve diçe. Bi vê kirinê, armanca dewletê ew e ku, gel bitirsîne û çandê bêxwedî bihêle. Dewlet vê yekê sedema hebûna xwe ya bingehîn dibîne.

Sedema duyemîn li hember vê pirsgerê rewşa weşanxaneyan ye. Pêşî divê em vî bibînin ku weşanxaneyan di vî mijarê de li ser dîrok û (ya nêzîk û dûr) wêje (edebiyat), helbest û berhemên çanda Kurdî lêkolîneke bi bingeh, zanistî, cidî, dorfireh û berhevkirinek kûr nekirine.

Ev kêmasiyeke mezin e.

Weşanên ku heta niha, çî ji alî weşanxaneyên pêşverû yênan Tirk û çî ji alî yênan Kurd hatine weşandin bi pirranî (ji xeynî çend heban) çawa, lê hatine

wiha weşandine. Gelek ji wan ne ji lêkolînen dorfireh hatine berhevkirin û nabin çavkanî, ji lêkolînen zanistî re. Ji ber ku wê demê dawxaza gel bi wan weşanan hebûye ji bo berjewendiyên xwe dokumanên ku bi dest xistine weşandine. Ev rewşa hanî bi kêmasî û netêr û nelayîq, bû sedemê sarbûn û dûrbûna xwendevanan ji weşanan. Sarbûna xwendevanan jî bû sedemê ku hin weşanxane vê xebatê ji rojeva xwe rakin. Belê di vî warî de hin îstisna hene. Ev bar ket ser milên weşanxaneyên bi bir û bawer.

Bêpirsiyariya hin weşanxaneyan xwendevan dîr kirin, dûrbûna xwendevanan ev xebat ji rojeva weşanxaneyan hilanî. Bi vî awayî daîreke fasî çêbû.

Ev çûyîn ber bi armanca dewletê ve diçe. Ev bi çî awayî bê nîrxandin jî sîc e. Pêwîst e ku weşanxaneyên di vî mijarê de, berhemên çanda Kurdî ji çavkaniyên zanistî û ji lêkolînen dorfireh berehev bikin û biweşînin. Da ku insan karibin van berhemên bikin çavkanî, ji lêkolînan re. Ev lêkolîna divê li welat jî, li derî welat jî bê kirin. Lê divê bê derengî antolojiya edebiyat, helbest, çîrok û romana Kurdî bê amadekirin.

Aliyê sêyemîn rewşa xwendevanên ye. Bi girîngî em li ser sersariya xwendevanên Kurd bisekinin. Sedemê vê sersariya wan cur be cur in. Sedema ye-



Pirtûkên bi Kurdî gelekî derketin, lê tîr eleqê nedîtin.

kemîn û giran; tevgera dewletê ya li hember xwendevanên welatparêzên Kurd e.

Di zemanên paşî de dewletê, di vê rewşê de xwe daye ser rêceke nû û bi wahşet. Ev rêç jî ew e ku weşanekê neteweyî gava di destê însanekî welatparêz de bibîne wî însanî kifş dîke û bi destê kontr-gerîlayên xwe dide kuştin.

Ji sed salan ve gelê Kurd di bin zordestî, nijadperestî, înkârî û jenosîda dewletan de maye. Ev jî bûye sedemê jihevketina zanîna neteweyî, di mejiyê insanê Kurd de. Ji ber vê, kesên Kurd ji şexsiyeta xwe ketiye. Xwendevanê di vî halî de, bi tîranî; cesarêt, xîret û fedakariyê nîşan nade. Ev rewş xwe di îstatistikên xwendin û firotina berhemên bi Kurdî ku ber jê hat de, diyar kir. Heta 1992'

yan 454 pirtûk der heqê Kurdan de hatine weşandin (bi Tirkî- Kurdî). Di nevbera 2000-3000 î de hatine çapkirin, lê li der dora 300-700 hebî hatine firotin. (Welat hej: 41 sal. 1992 rp: 11)

Xebera paşî ku em bibêjin di vê rewşê de tu hêviya me û daxwaza me, ji dewletê nînc e û nabe jî. Pirsgerê a me ye û wê bi me çareser bibe. Lê belê ji xwendevanên Kurd û weşanxaneyên re çend gotinên me hene. Têkoşîna neteweyî ne tenê li ser milên tîkoşerên çekdar e. Têkoşîna çandî jî parçeyekê girîng e di tîkoşîna azadiyê de. Çawa ku tîkoşerên çekdar di şerê azadiyê de cesareta bilind, fedakariya bêsinor nîşan didin, herwiha di tîkoşîna çandî de jî divê ev nîrx bê tîrs û bi fedakarî bê nîşandin.

Nivîskarên Kurd vedigerin ser zimanê xwe

Murat Ergin


Di van demên dawî de di qenalen ku tîkoşîna rizgariya neteweya Kurdistan vekirîye de edebiyata Kurdî jî tînan (zîl dide) dide. Baş an xirab bi du hev re pirtûkên edebî yênan bi Kurdî derdikevin. Di warê helbest, roman, kurteçîrok û hwd. Nivîskar û ronakbîrên Kurd vedigerin ser zimanê xwe. Kesên ku heta doh bi zimanê Tirkî dinivîsandin îro berhemên xwe bi Kurdî dinivîsînin. Ev rewş ji alî edebiyata Kurdî ve geşbûneke gelek baş e. Qey berhemên ku bi Kurdî ne tev baş û bi qelîte ne? Na; bi rastî jî di nav pirtûkên Kurdî yênan di van salên dawî de derketine de, ji alî edebiyatê ve yênan delal û bi qelîte weke tîlikên destekî inçex hebin. Lê em di nav feqîriyê de ji dewlemendiyekê dibînin. Bi rastî jî berhemên Kurdî çiqas pîrr bin wê wextê siûda xwendevanan a ji bo neqandinê ji zêde dibe. Ji bo edebiyata

Kurdî tiştê herî baş, ew e ku nivîskarên Kurd ên ku berê bi Tirkî dinivîsandin îro dest bi nivîsandina zimanê Kurdî dikin. Ji van nivîskaran yek jî nivîskar Lokman Polat e. Lokman Polat Kurd e. Lê berî niha pirtûka xwe ya yekemîn (Barbar Kasırgası) bi Tirkî nivîsîbû. Lokman Polat, bi pirtûka xwe ya duyemîn ku bi navê xwe Evîn û Jiyan e vegehiya ser zimanê Kurdî.

Pirtûka Lokman Polat Evîn û Jiyan, ji 14 kurteçîrokan çêbûye. Tiştê ku peşî bala me di vî pirtûkê de dikişîne gelek firehbûn û klasîkbûna navê pirtûkêye.. Di kurteçîroka Evîn û Jiyan ku navê xwe daye pirtûkê qala evîn û serpêhatiya du ciwanên Kurd tê kirin. Di nav vî çarçovê de, li ser doza xwiniyê (kan davası) ya li Kurdistana berê tê sekinîn. Babeta kurteçîrokê li Kurdistana berê di navbera gundekî û bajarekî de derbas dibe. Lokman Polat evîn û serpêhatiya Seher û Sîdar bi realizmeke

ziwa û bi forma qilasîkî ya cih, dem û bûyer nivîsiye.

Ji xeynî kurteçîroka Evîn û Jiyan du-sê kurteçîrokên din de jî hema hema neverok wek hev in: Evîna du ciwanan, ji hev cudabûyîna wan, dozên xwiniyê û hwd. Lê nivîskar ji qalkirina şoreşgerên berê jî dûr nakeve.



Berga 'Evîn û Jiyan'

Mesela di kurteçîroka Newîn û Badîn de, nivîskar bi lez û bez şoreşgera tîne hewara Newîn û Badîn û dîke ku bi awayekî (em nîzanin çawa ye?) pirsgerê wan çareser bibe. Di dawî ya kurteçîrokê de Newîn û Badîn bi hev rebûna xwe şa dibin. Şoreşger jî wek hatina xwe bi lez ji gel cuda dibin, pêxwas û tazî xwe davêjin çiyayên Kurdistanê. Di pirtûkê de kurteçîrokek bi navê Dixtor û Serbaz heye ku mirov nîzane ji bo çî hatiye nivîsin. Bi kurtî naveroka kurteçîrokê li ser şerê peşmergêyan başûrê Kurdistanê û leşkerên Tirk e. Lê di kurteçîrokê de şer û serfiraziya peşmergêyan gelek bi mubalexeyan tê zimên. Li gor dîtina me huner û Edebiyat dikare ji xeynî realizma objektîv hinek tiştên din ên fantastîk bike babeta xwe. Lê ku berhemek bi şeklê realizma objektîv hatibe nivîsin gereke di naveroka xwe de qaîdeyên wê bîne cih û di naveroka xwe de jî bûyerê bi şeklekî realist ku mi-

rov jê bawer bikin bide. Di vî kurteçîroka Lokman Polat de, bi rastî em vî tiştî nabînin.

Kurteçîrok di warê şîkil û estetîkê de jî gelek qels e, kurteçîrok bê taswîr, bê îmgê, xwerû bi axaftin û gotinan diçe. Jixwe axaftina li ser qehremaniya peşmergêyan hewqas cih girtiye rê nedaye ku nivîskar piçîkekê taswîr bike.

Kurteçîrokên pirtûkê bi pirranî, bi zimanê axaftinên rojane hatiye nivîsin. Kurteçîrokên Lokman Polat, li alî din jî di kurteçîrokên xwe de rewşa Kurdistana berê, êşên jinan ku yênan li ser evîn û xizaniyê û birakujiyê bi gotinên şewat tîne tînan zimên. Lê divê nivîskar kurteçîrokên xwe ji alî taswîr û gotinên edebî ve bixemilîne. Em bawer in eger mirov li ser bisekine wê bibîne ku, zimanê Kurdî gotinên edebî yênan dewlemend di nava xwe de veşartîye. Kar û peywir ew e ku em dewlemendîya zimanê Kurdî derxin holê.

NAVÊN MEHÊN KURDÎ

1- OCAK (Januar, January, Janvier)

-Çile, Çileyê Paşin, Rêbendan/ Rêberdar, Befranbar/ Berfanber/ Befranber duyemîn, Kanûna Paşin

2- ŞUBAT (Februar, February, Fevrier)

-Sibat, Reşeme/ Reşemeh, Polan, Gecok

3- MART (Marz, March, Mars)

-Adar, Avdar, Newroz, Noroj, Xalel, xakelêw, axalêwe, axlêwe, Newrozhang

4- NISAN (April, April, Avril)

-Nisan, Cotmeh, Banemer, Benamer, Hirmê Pişkûan, Gulan, Şeştebaran

5- MAYIS (Mai, May, Mai)

-Gulan, Cozerdan, Cehzerdan, Baranbiran, Bextebaran

6- HAZİRAN (Juni, June, Juin)

-Hezêran/ Hezîran, Hizêran/ Xizêran, Pûşper, Xermanan, Bextebaran, Cehzeran, Germacıman, Coxinan, Xêve

7- TEMMUZ (Juli, July, Juillet)

-Tirmeh, Xermanan, Gelawêj, Miwegeran

8- AĞUSTOS (August, August, Août)

-Tebax, Gelawêj, Pûşper, Miwegeran, Berewpayîz

9- EYLÜL (September, Septembre)

-Îlon, Rezber/ Rêzber, Gelerazan, Gelawêj, Mîran, Kergehan, Kewçerîng/ Kewçer

10- EKİM (Oktober, October, Octobre)

-Çirî, Çiriya Pêşin, Cotmeh, Gelerazan/ Gelerêzan, Kewçerîng, Xezelwer

11- KASIM (November, Novembre)

-Çirî, Çiriya Paşin, Teşrin, Mijdar, Sermawez, Agirdan

12- ARALIK (Dezember, December, Décembre)

-Kanûn, Kanûna Pêşin, Çileyê Paşin, Berçile, Berfanbar/ Befranber/ Befrenbar/ Berfbaran, Kewberdar, Scholbendan

1. Rojîjmêra Kurdî bi meha Adarê destpê dike, bi meha Sibatê diqede.

2. Memo Larousse, bergeh 1 (rp.188-189).

JÊDER (Dawing/ Netice)

Ev vekolîn divê bi belge û çavkaniyên nû ve were firehkirin û kûrandin (16).

Rojîjmêr (Salname - Teqwîm)

2 LÊKOLÎN KAYA MÜŞTAKHAN

	10	11	12	13	14	15	16	17
	KURTERASTI A.TIGRÎS	B.SORAN Govend H.3	D.İZOLİ FERHENG	J. BLEU FERHENG	T. WEHBI 1971-London	K. NEWROZÊ Salname 1983	DILDAR BERWARI Roja Nû H.3, 1983	TORİ Al. Kurdî
1	Çileyê Paşin	Befranbar	Rêbendan	Rêbenan	Navzistan	Rêbendan	Befranber duyemîn Rêbendan	Rêbendan
2	Sibat	Reşeme	Reşeme	Çile	Polan	Gecok	Reşemeh/ Reşeme	Reşeme
3	Adar	Adar	Xalêw	Newrozhang	Noroj	Newroz	Newroz, Adar, Xakelêw Axelêwe, Axlêwe	Adar
4	Nisan	Cotmeh	Banemer	Harmê Pişkûan	Gulan	Banemer	Gulan, Banemer, Şeştebaran	Banemer
5	Gulan	Gulan	Cehzerdan	Gulan	Baranbiran	Cozerdan	Cotan, Cozerdan Bextebaran	Gulan
6	Hizêran	Xermanan	Pûşper	Bextebaran	Germacıman	Cehzeran	Xêve, Pûşper, Coxinan, Xiziran	Pûşper
7	Tirmeh	Tirmeh	Xermanan	Xermanan	Gelawêj	Xermanan	Tirmeh, Xermanan, Miwegeran	Xermanan
8	Tebax	Pûşper	Gelawêj	Miwegeran	Berewpayîz	Gelawêj	Tebax, Gelawêj, Gelawêj	Gelawêj
9	Îlon	Gelerazan	Rezber	Gelawêj	Mîran	Kergehan	Kewçerîng, Rezber	Rêzber
10	Çiriya Pêşin	Kewçerîng	Gelerazan	Gelerazan	Gelarêzan	Gelarêzan	Gelarêzan, Xezelwer Çiriya Pêşin	Gelerazan
11	Çiriya Paşin	Sermawez	Sermawez	Sermawez	Agirdan	Sermawez	Sermawez, Çiriya Paşin	Sermawez
12	Çileyê Paşin	Gelawêj	Berfbaran	Kewbedar	Scholbendan	Befranbar	Befranber, Kewberdar	Befranbar

2. Rojîjmêra Tirkî bi meha Ocak (Çile) dest pê dike, bi meha Aralık'ê (Kanûn) diqede.

3. Rojîjmêra Asûrî bi meha Nisanê dest pê dike, bi meha Adarê diqede.

4. Rojîjmêra Babilî bi meha Nisanê dest pê dike, bi meha Adarê diqede.

5. Rojîjmêra Îbranî bi meha Tîşrî dest pê dike, bi meha Îlonê diqede.

6. Rojîjmêra Avestayî bi meha Firavartinê despêdike, bi meha Spendarmat diqede.

7. Rojîjmêra Erebbî bi meha Muharramê dest pê dike, bi meha Zilhîce diqede.

Çavkanî: 1. Aksoy, Gurdal, Kürt Dili ve Söylenceleri (rp.123, 124, 126, 128- Avesta, Asûr, Babil.

2. Memo Larousse, bergeh 1 (rp.188-189).

JÊDER (Dawing/ Netice)

Ev vekolîn divê bi belge û çavkaniyên nû ve were firehkirin û kûrandin (16).

Mezopotamya, navenda dîrok û kultureke pîr dewlemend e.

Dîrok bi nivîs ve dest pê dike.

Bi vedan û kolana kolanzanan û bi xwendina pisporên keviran qermîtan hatiye peyitandin ku nivîs, di vî herêmî de hatiye nûve-dîn.

Gelên Mezopotamyayê di stêrenasî û stêrezaniyê de jî gelek pêşve çûbûn. Rojîjmêrên heyvî, heyvî-rojê û rojîjmêra rojê rastandî bûn.

Gelên Mezopotamya di herêmên xwe de cure cure rojîjmêr bi kar anînin. Lê mixabin destpêka mehan hevûdu nagire.

Bi taybetî di nav rojîjmêrên Sumeriyan de tevliheviyeke giran heye. Mînak: Di rojîjmêra olî de meh bi Nisanê dest pê dike; di ya gelî de bi meha Nisanê diqede.

Di rojîjmêra Lagas, Umna û Ur de meha yekemîn bi Adarê dest pê dike. (Şe.Gur.Kûd) (17) Di ya Sumeriyan de meha dawîn meha Adarê ye (Binihêr, Gurdal Aksoy.. rp.126, 127, 128)

Di vekolîn û hûrandina vê mijarê de tiştên bal dikîşîne ev in:

-Destpêka şahî û mihrîcanên olî an xwezayê di meha Adar/ Nisanê de tê pîrozkirin (Binhêr, listeyên navên mehan 1, 2, 3).

-Sersala gelên Îrana kevn (antîk) berê di payîzê, dawî jî di biharê de hatiye pîrozkirin (18).

-Salê du car, wekhevîya şev û rojê (Adar û Îlon), salê carek şev-dirêjî/ rojkurtî (Kanûna Pêşin), carek jî rojdirêjî/ şevkurtî (Hezêran) bi mihrîcanan dihate pîroz kirin. (19).

-Heta sala 1752 ê zayîne (mîlad) Îngîlistan (Britanya) di 21'ê Adarê de sersal çêdikirin, di dawiyê de bi biryareke parlamento-ya xwe sersal hildan meha Kanûna Paşin (Çile) (20).

-Di rojîjmêrên biyaniyan de (Tirk, Îbranî, Asûrî, Sumerî û Romayî) navên peyiv, hejmaran û mehan hene (21).

-Gelek peyivên Sumerî û Kurdî nêzikî hev in (22).

ŞIROVEKIRINA MEHAN

Di vê vekolînê de hevdeh çavkaniyên mehên Kurdî henin. Mehên bi pirranî hatine pejiran-

Wê bidome

ŞIROVEKIRINA MEHAN - 4

Bi Tirkî	Bi Kurdî(a)	%	Bi Kurdî(b)	%
1. Ocak	Çile	68	Rêbendan	32
2. Şubat	Sibat	84	Reşeme	16
3. Mart	Adar	94	Newroz	6
4. Nisan	Nisan	75	Banemêr	25
5. Mayıs	Gulan	98	Cehzerdan	2
6. Haziran	Hezêran	68	Pûşper	32
7. Temmuz	Tirmeh	91	Xermanan	9
8. Ağustos	Tebax	83	Gelawêj	17
9. Eylül	Îlon	68	Rêzber	32
10. Ekim	Çiriya Pêşin	60	Gelerêzan/Cotmeh	22-18
11. Kasım	Çiriya Paşin	68	Sermawez/Mijdar	22-10
12. Aralık	Kanûn	68	Berfanbar	38

Meh	KURDÎ	TIRKÎ	ASÛRÎ	ÎBRANÎ	BABILÎ	AVESTAYÎ	EREBÎ	FARISÎ
1	Kanûna Paşin	Ocak *	Tebet	Tevet	Tebet-Tebetû	Dîn	Şaban	Behmen
2	Sibat	Şubat	Şubat	Şevat	Şebat-Şabatû	Vahûman	Ramazan	Îspend
3	Adar *	Mart	Adar	Adar	Adar-Adarû	Spendarmat	Şevval	Ferwerdîn *
4	Nisan	Nisan	Nisan *	Nisan	Nisan-Nisanû *	Firavartin *	Zilkade	Erdîblhuşt
5	Gulan	Mayıs	Ayar	ÿyar	ÿyar-Ayarû	Artavahist	Zilhîce	Xûrdat
6	Hezêran	Haziran	Sivan	Sivan	Sivan-Sivanû	Horvadat	Muharrem *	Tîr
7	Tirmeh	Temmuz	Temmuz	Tamûz	Tammuz-Dûûzû	Tîr	Seger	Mûrdat
8	Tebax	Ağustos	Ab	Av	Ab-Abû	Amerodat	Rebiyûlewel	Şehriyewed
9	Îlon	Eylül	Eilûl	Îlûl	Eilûl-Ûilûlû	Satvairo	Rebiyûlahîr	Mîhr
10	Çiriya Pêşin	Ekim	Teşrîf	Tişrî *	Tişrî-Teşrîfû	Mitro	Cemozylawel	Aban
11	Çiriya Paşin	Kasım	Arahsamna	Heşvan	Arahsamna-Marçevşvan	Avan	Cemozylawahîr	Azer
12	Kanûna Paşin	Aralık	Bîsilimnû	Kislev	Kislimû	Ataro	Recep	Di

Navê wê Gulîstan bû

Zulfikar Tak / Girtîgeha Ceyhanê

Wek Şivan ew ji deh salî bû. Derd û kulê ku wê ditibû sed salan rane-dikir. Lê hêja deh salî bû. Weke her zarokên Kurdan di bin bandûra şerê felatiya neteweyî de bû.

Digot, "du salên min manê. Du salên din ezê herim şoreşê, ezê ji şoreşger bim."

Xwendevan bû, şagirta bavê xwe, suxteya apên xwe yê din bû "Min pîr bêriya we kiribû", "Min dixwest ez bêm we bibinim, lê nebû. Mêrdin pîr dût e", "Bavê min çû eskeriyê. Eskeriyê bavê min heta ku şerê felatiya neteweyî bajo, heta ku welat bifilite wê dom bike. Ku heta du salên din welat nefilite, wê gavê ezê ji herim şoreşê; li dijî neyaran, bêbext, xwefiroş, Kurdkuj û sixuran şer bikim."

Bi navê xwe Gulîstan bû.

Keçikeke Kurd a bextereş bû. Lê belê di demajoyeke bextewer de dijîya. Ev rastî, siût û bêsiûdiya wê bû. Bavê wê nû hatibû berdan li girtîgehê (zindan); mehekê li mal mabû û bi şûn ve winda bûbû. Çûbû "eskeriyê". Bavê Gulîstanê ji Gulîstanê re gotibû; "Ez diherim eskeriyê". Herdu çavên wê ramûsabû û porê wê miz dabû. Li hember helwestên bavê xwe bi awireki ber-gene, çavên xwe yên wek ên karxezalan di nava çavên bavê xwe de çiq kiribû û gotibû: "Ezê ji bi te re werim eskeriyê." Bersiva bavê wê kezêba Gulîstanê guvaştibû, lê dest û piyên wê ji girê dabû. "Ez diherim. Tu li ba dayîka xwe û birayên xwe bimîne. Birayên te hêja zarok in. Ji dayîka xwe re alikariyê bike, ku birayên te mezin bûn, ezê bêm te ji bibim, herim. Du salên din... Ne zêde, du sal". Serê Gulîstanê ketibû ber. Weke ku hemû dinya bi ser serê wê de hilweşe.

Gulîstanê, bavê xwe tenê bi rê kir. Dema ku bavê Gulîstanê dil bû, digot: "Gulîstana min gava ku ez derketim ez û tu emê herdu tev herin ba Serok. Hevalê me dê te di Akademiya Mahsum Korkmaz de perwerde bikin. Piştî perwerdebûna te, heval dê çekan ji bidin te. Wê gavê ez û tu emê herdu li dijî dijminê gelê xwe şer bikin." Gava ku bavê Gulîstanê digot: "Dibe ku heval te bikin serdara min, min ji bikin leşkerê te. Ezê werim ba te, bêjim, 'Serdara min ferman ke'". Gulîstan dikeniya û xwe li stuyê bavê xwe wer dida. Û bav û keça wî herdu hevûdin maç dikirin bi dilekî şad... Piştî dîtina dilên girtîgehê, Gulîstan û dayîka xwe diçûn malê, di rê de van tiştan difikirî. Li mal gava ku bi tenê, an jî êvarê diket nava cihên xwe ji bo razanê, heta ku di xew re here, çuyina xwe û ya bavê xwe ya şoreşê difikirî. Car hebû fikrê çuyinê tenê qîma xwe nedianî, xeyal çedikirin. Di xeyalên xwe yên çekirî de, xwe di nava cilên leşkerî de didît. Di destê wê de çek, tevli hevalên xwe yên gerîla ber bi çîla çiyayê Cûdî dimeşîyan. Belê hevalên wê yên gerîla ku tev dimeşîyan tu kes nas ne dikir, di rastiye de ji, tu kesê wisa tu-

ne bûn. Gulîstanê hevalên xwe yên gerîla di xeyalê xwe de, bi xwe çekiribûn. Yek carna şiklê sûretê apên wê yên dil, diket ser rûyê hevalên Gulîstanê yên gerîla. Gulîstanê hevalên xwe bêyî çekan, bi alên partî, arteş û eniyê ve ji xemilandibûn. Gelek caran ev xeyalên Gulîstanê diherikin xewnen wê û heta sibê dajot.

Min jê pirs kir:

-Tu ji bavê xwe an ji dayîka xwe zêdetir hez dikî?

Ser min de vegeyîya, çavên xwe ziz kirin û berdan nava çavên min. Bi awireke tûj û bi dengê tenik û bilind got;

-Ji herdukan ji hez dikim.

-Ez jî, ji herdukan hez dikim. Lê ji dayîka xwe hin zêdetir hez dikim. Min jî te pirsî got: "Tu ji kîjanî zêdetir hez dikî", min negot ku, "Tu ji kîjan hez dikî". Netirse, ji tu kesekî re nabêjim.

-Tu yê nebêjî?

-Ma ezê ji kêre bibêjim? Ji bir neke, ez di girtîgehê de dil im!

Vegeyîya ser milê xwe yê rastê. Bi awirekî pirsîyarî li hevalê ku li dorhêla me civiyabûn mêze kir. Hevalan bi hev re serê xwe hejandin û bi awirên xwe gotin: "Na, nebêje". Bi Şûn ve,

-Ji bavê xwe zêdetir hez dikim. qasî xwe qeherand û got:

-A ku tu mezin kirî, ya ku evqas derd û êşên we kişandin, a ku hûn xwedî kirin ne dayîka te bû? Ji bo çî tu zêdetir ji bavê xwe hez dikî?

-Dayîka min bû.

-Bavê te ji bo we çî kir ku tu ji dayîka xwe zêdetir ji bavê xwe hez dikî? Bavê te şerê salan di girtîgehê de li kêfa xwe mêze kir. Gava ku bavê te hat girtin, tu sê salî bûyî, wexta derket, salê te bûbûn neh. Ku hat bi şûn ve qasê mehek tenê li mal, li ba we ma. Bi rastî, te baş ser û çavên wî nedîtî. Bi rastî min fêhm nekir tu ji bo çî zêdetir ji bavê xwe hez dikî? Hîîî hat bîra min; tu ji bo şorbeşîrê zêdetir ji bavê xwe hez dikî.

-Na welleh. Ne ji bo şorbeşîrê. Şorbeşîr carek tenê ji me re çekir, wê carê jî binî girtibû, binê beroşê şewitibû. Nihat xwarin, me rijand.

-Êêê ji bo çî?

-Bo ku bavê min şoreşger e. Ez ji hemû şoreşgeran hez dikim.

-Tu li vir çî digerî? Şoreşger li serê çiyar in.

-Ez hêja zarok im. Du salên din bi şûn ve ezê ji herim şoreşê; bavê min dê were min ji bibe.

-Mazlûm û Delîl berdan.

-Wîiş, ma negirtibûn ku.

-Rojnameya 'Özgür Gündem'ê nivîsibû.

-Hatîn, hatîn mala me tev dan, henc û tiştên me li nav hev û din xistin û çûn.

-Çawa?

-Polîs û timên taybetî avêtibûn ser taxa me. Malên taxê hemû tev dan. Hatîn mala me jî tev dan. Gava ku mala me tev didan, polisekî bi kamera wêneyên me dikişand. Delîl qeherî û xwe avêt ser çeka



polisekî...

-Delîl çend salî ye?

-Delîl şeş, Mazlûm heft salî ye.

-Êê, gava ku Delîl xwe avêt ser çeka polîs çî digot, polîs çî bersiv da Delîl?

-Delîl, ji polîs re çêr (sixêf) diki-rin. Polîs jî bi Tirkî digot: "Dur oğlum". Gava ku polîs got, "Dur oğlum", dayîka min hêrs bû û li polîs vegeyîya û jê re got: "Ma tu şerm û fedî nakî, kurê min ji ku dibê 'oğil'ê te."

Xwestin toqeya min bigirin, min nehişt.

-Ji bo çî?

-Toqeya min kesk, sor û zer bû. Dayîka min ji bo min bi rengên neteweyî xemilandibû. Min neda polîsan. Belê, polîsan di tev dana malên taxê de hemû toqeyên kesk, sor û zer berhev kiribûn. Digotin, "yasaktir".

-Ji bo çî rengên kesk, sor û zer qedexê kirine?

-Wîîî ma qey tu nizanî ji bo çî qedexê kirine?

Ez xistim cihê teng. Bi rastî ez bi piyê xwe ketim faqa ku min danibû, min xwe parast.

-Zanim, belê zanim zanim. Min got ka tu zanî, nezanî.

-Ez çawa nizanîm, zanim zanim.

-Di tevdanê de tu tiştên we birin?

-Erê, birin. Qerta ku bavê min par ji bo pîrozkirina newrozê ya ku li vir ji me re bi rê kiribû girtin. Wêne yên ku bavê min li vê derê tevli we kişandibûn ji girtin, birin, me ji wan xwestin, lê nedan.

-Polîsan ji we çî pirsîyar dikir?

-Bavê min.

-We çî got?

-Me got, "Em nizanîm". Em girtin birin ser rîya makîna. Em li ser rê hiştin, hemû li panzer û cemseyên xwe siwar bûn û çûn. Em ji hatin mala xwe. Qasê çend saetî din bi şûn ve vegeyîyan, go-tin, emê mala we carekî din tev din. Dayîka min çû kasa derî xeti-

mand û ji polîsan re got: "Ku hûn verin ezê mifteyê bavêjim. We bîstek berê mala me tev da, ma ne bes e. Ez nahêlim hûn carekî din tev din." Ku polîs ber bi dayîka min ve çûn, dayîka min mifteyê avêt ba cîrana me, cîrana me jî bi dizika mifteyê ji erdê rakir û xiste berîka xwe. Polîsan ji got qey bi rastî dayîka min mifteyê avêt û mifte winda bû.

-Paşî çawa bû?

Gulîstan bi rastî nizanibû ku çawa bû. Gava ku polîs û dayîka Gulîstanê pev diçûn, cîrana wan a ku mifte girtibû, gazî Gulîstanê dike, dibê maleke dût. Gulîstan nexweş e ji bo ku ber bi dayîka xwe nekeve û hin zêdetir nexweş nekeve, çend rojên din bi şûn ve dişîne Edenê ba mala metika wê.

Dayîka Gulîstanê û birayên Gulîstanê Delîl û Mazlûm wê gavê girtine, di bin îşkence û lêdanê de. Belê tu kes nizanê li ku derê ne. Tu haya kesekî ji wan tune ye; bêyî polîsan û xwediyê wan dewleta dagirker. Ew jî, ji tu kesekî re nabêjin. Niha dayîka Gulîstanê jî dil e. Ku haya wê ji rewşa dayîka wê hebe ewê hin zêdetir ji kê hez bike, ez nizanîm.

Gulîstan li girtîgehê, danek mêvanê me ma. Wexta nivro, tevli zarokên din derxistin derve. Gava ku çû, ji apên xwe yên dil re got: "Ezê carekî din ji bêm. Bîrve nekî, roja 15'ê Tebaxê, ez li ba we me."

Lê belê Gulîstan, roja 15'ê Tebaxê nehat. Weke ku tê zanîn roja 15'ê Tebaxê li Edenê, ji bo salvegera hilpişkîna neteweyî meşek mezin çêbû. Li gor ku rojnameyan nivîsî 30.000 (sîh hezar) kes meşîyan. Di nava sîh hezar mirovî de Gulîstan hebû an tune bû ez nizanîm, lê ew sîh hezar kes di roja 15'ê Tebaxê de hemû Gulîstan bûn, Gulîstanên ku kullîkên azadiyê vedidin.

Gulîstana min, apên te hemû ji te hez dikin û hêvîdarên mezinbûna te ne. Du sal, ma du sal çî ne?...



ADAR JAVAN

Di hînim wê pora çî yê zêr
Te ji wê rîdî xwazim bi xêr
Girê dirî xemî û xaza te
Te siwarî kim payîzî bi xêr

Tu car te nadim heyara
Te naxim destê nemara
Bîşikînim wan baskê te
Tişa berdîm ser guhara

Tu pîr rindî kirasî sorê
Qiz û xortanî xwedan dorê
Te j'bir nakim, te bernadim
Heya ku ez bidim gorê

Dest bi bazîngîngî bi xirxalê
Ji mir biv kevaniya malê
Li hêviya te me xezala min
Bi hisreta heftê salê

Kesk û sor û zer xemla te
Xwîna min bûye hinna te
Tê didim wê porê tey kej
Di heriki ser bejna te

Ji bo te ez dîn û har im
Dil bi kul im birîndar im
Birîna min xwîn û elem
Ji ceger de kûr dinalim

Ger bidin min Hînd û Etles
Dil ji xeynî te nabê kes
Tu ya min î sorgula min
Na xwazim te bîhnê ku tes

Bejn zirav tak rîhana min
Tu wî gula ber bîhna min
Gava ku ez te dibînim
Xew-xwarin nayê bîra min.

Sînga tê tevdî misk û ember
Xwîna pîroz dirije ser
Ji dil û can av didim ez
Şîn dibê bîhnê dîde her der

Delalê, bûkê ciwanê
Te deng daye li cîhanê
Çiqas şîrîn e navê te
Rih û canê Kurdistanê

Yozgat

Koma Mezrobotan: Hem dozdar e û hem qazî ye

Reng û forma muzîka Koma Mezrobotan eşkere ketiye bin tesîra muzîka "çepên" Tirkîyê. Kesê ku muzîka Ahmet Kaya bi-hîstibe wê bi hesanî vê şopê bibîne. Ji bona nîrxandina berhemên hunerî, ançex mirov dikere li berheman hûr bibe, ne li kesên ew berhem afirandine.

Goranê Haco

Diroknasê Ermenî Abovyan digot: "Her Kurdek bi tebîta xwe şair e". Ew li her deverên Kurdistanê hema rastî dengbêjan hatibû, biçûk, mezin, jin, mêr, malmezin, hejar ji her celebên civaka Kurdî her Abovyan rastî dengbêjan hatibû. Gotinên Abovyan hatin bîra min, gava min di rojnameya Welat de hevpeyvîna bi Koma Mezrobotan re xwend. (Welat hej. 24)

Niwênerê (mumesil) Koma Mezrobotan, dengbêjên Kurd yek bi yek dihejmêre û dibêje: "Ew muzîkê çênakin, ew bi tenê teqlîd dikin. Mirov nikare ji wan re hunermend an jî muzîkvan bibêje." Li vir tiştêk tê hişê mirov, ma gelo berî Koma Mezrobotan çêbibe, tiştêk hebû navê wê muzîka Kurdî? An jî, gelo gelekî bi navê gelê Kurd yekcar hebû? De malavano! Hinêkî nefsbîçûk bin û bila însafa we hebe. Nabe mirov hem dozdar û hem qazî be. Mîna her kesî

dengbêj ji, zikê wan ji hev dêşê, loma nelêye Mezrobotan çî di heqê kom û dengbêjên din de bibêje. Çawa her dengbêj, Koma Mezrobotan jî gerek e nîrxandina berhema xwe bi hêviya guh-

kin! Di warê siyasetê de me dît ku hinekan, nemaze li bakurê Kurdistanê, destpêka tevgera niştimanî ya hemdemî, di avabûn û têkoşîna xwe de dîtin. Eger mirov bi însaf û heqanet bibêje, ev gotin heta hedekî mezin, rast e û dikeve mejiyan, nexasim eger mirov rewşa bakurê Kurdistanê ya perîşan di dema berî sala 1984'an de bide bîr çavê xwe. Lê ev gotin eger di warê siyasî de

yeta wî ji "kilam û besteyên kevin" çî ye? Eger ew çêla (behsa) muzîka folklorî dike, jixwe çare nîn e mirov tekrar û teqlîdê neke. Lê eger mebesta wî kilam û besteyên ku nîfşên berê ji dengbêjan gotî, jixwe gotina wî di cihê xwe de ye. Piştî min hevpeyvîna bi komê re xwend, ne bi gelekî qaseta wan kete destê min. Li gor zanîna xwe yî hindik jî, li ser muzîkê, bi rihetî min tê derxist ku, tu ferqeke bingehî di navbera muzîka Koma Mezrobotan û muzîka bi dehan dengbêj û komên Kurdî de nîn e.

Beşê stranan ên "polîtîkî" eynen "tekrara" naveroka bi dehan stranên dengbêjên din e. Eger "babeta taybetî" cuda be jî, lê "babeta gelemperî" ya stranê ne hatiye guhertin. Yanî eger Mezrobotan li ser Wedat Aydin stran gotiye, yekî din berê li ser Egîd an jî, li ser Leyla Qasim gotiye. Wekî din jî, gotinên stranan bêhtir ji stranê, layîqê gotar an jî xitabên siyasî ne. Di wêjeyê (edebiyat) de mirov ji bo xatirê bedewiya edebî û ji bo herikandina tîksta bêjeyî, nemaze di şîr de, tiştan yekser bi nav nake; bêhtir sembolan û wênayên şîrî bikar tîne. Pêwîst dibînim bibêjim ku, helbestên qa-

setê ne bîyî şaşiyên gramatikî ne.

Reng û forma muzîka Koma Mezrobotan eşkere ketiye bin tesîra muzîka "çepên" Tirkîyê. Kesê ku muzîka Ahmet Kaya bihîstibe wê bi hesanî vê şopê bibîne.

Ji gotinên niwênerê Koma Mezrobotan tê xuyakirin ku, gerek e "Muzîkvanê Kurd siyasetê di muzîka xwe de birêse", yan nexwe ew muzîk ne bi "rûmet e" Ev gotin gelemperî rast e, lê ez ji Mezrobotan tediğim ku dengbêjek, tevî ku mîna wan, bi umûmî derbarê eynî babetan de dibêje, lê girêdayî xetêke siyasî ya din e, yan jî li derî welat diji, nikare bibe xwediyê muzîkeke bi "rûmet". Ji bona nîrxandina berhemên hunerî, tenê mirov dikere li berheman hûr bibe, ne li kesên ew berhem afirandine. Wekî din, ma gelo li welatekî ku heta niha zimanê wî qedexe ye, ma stran û kilamên gelêrî ne xebateke "polîtîkî ye"?

Niwênerê Koma Mezrobotan, li dawîya hevpeyvînê dibêje: "Ji bo pêşveçûnê em bendewarên rexneyên xwendevan in." Ev jî para min û bi hêviya gelek komên heja ku em bê hesab muhtac in.



Hevpeyvîna bi Koma Mezrobotan re di hejmara 24'an de derketi bû.

daran û xelkê ve bihêle, ne bi xwe halan (pwanan) bide xwe. Gotinên Mezrobotan têne wê maneyê ku, ew muzîka ku em ji dil û can jê hez dikin, ew dengbêjên ku em, mîna Kurdan serê xwe bi wan bilind dikin, hemû bi avê de ye û ferz e em rûpelekî taze di vî warî de ve-

rast be, nayê wê maneyê ku ev tişt di warê muzîk û hunerê de jî rast e. Bila çiqas ev kom an ew hunermend nêzîkî tevgerê siyasî ya biserketî be jî. Niwênerê Koma Mezrobotan dibêje: "Muzîk divê tekrara kilam û besteyên kevin nebe." Ez tînegihim ni-

XAÇEPIRS

Amadekar: Rasto Zîlanî

Çeperast: 1-Kovara Hetawî Kurd derdixist, endamê Cemiyeta Hêvî'yê bû. Ji Moksiyê bû. Di wênê de tê dîtîn/ Li Mezopotamya bajarvaniyek Kurd 2-Pêxemberê filehan/ Veketin, raketandin 3-Parzemîn, qit'a/ Rewşen, ronî 4-Ard/ Ji me re diyarî/ Pêwendî, têkilbûn 5-Kofte/ Sewalek 6-Navekî mêran/ Di alfabeya Kurdî de xwendina tîpekê 7-Çav/ Gindirandin 8-Kinnivîsîna litreyê/ Niwênerê welatekî li welatên biyanî 9-Stîleke tîpê 10-Rengek/ Xwenêzkirin û ji nû ve bilindbûna firokeyan bi erdê ve

Serejêr: 1-Bandor, tesîr/ Hêlîn 2-Dîl/ Jehreke ku pê rewil tene kuştin 3-Nebatek ji cinsê baqilan/ Nijadek/ Sembola Îrdiûmê 4-Hebûn, dewlemendî 5-Çiçeka abanozê/ Tiştê ku tê dîtîn 6-Cêb/ Zixur, neqeb 7-Cînavka kesane ya yekemîn/ Pêşeng, pêşawa, rêzan 8-Seyhet, tûr/ Derebe, kepenk 9-Dayik li ser zarokan distirin 10-Wekok 11-Di Quranê de navê sûreyek 12-Rîk

	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12
1												
2												
3												
4												
5												
6												
7												
8												
9												
10												

BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÛYÎ

Çeperast: 1-Egît/ Eselî 2-Dergavan/ Der 3-Aristoteles 4-Lîs/ Îro/ Aare 5-En/ Am/ Reklam 6-Termos 7-Nail/ Ma 8-Id/ Nobel 9-Def/ Jale 10-Axîret Serejêr: 1-Edalet/ Îde 2-Grînende 3-Îrîs/ Ra/ Fa 4-TGS/ Amîn 5-Etîmolojî 6-Evor/ Bar 7-Sator/ Mele 8-Ena/ Esalet 9-Lak 10-Îdeal 11-Esra 12-Îr/ Em

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiye razînin:

Li Tirkîyê û li derve: Y. Serhat Bucak

Îş Bankası Çağaloğlu Şub.

Döviz tevdiat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevî kopiyeye pelê razandina bedelê abonetiye bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Çağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercên abonetiye:

	Li hundir	Li derve
6 meh	120.000	60 DM
12 meh	240.000	120 DM

Hikayeta Mîrê Hekkariyan û mizgîniya teyrê biharê

Zemanê berê li Hekkariyan mîrek hebû. Gelek bi aqil bû. Navê wî Mîr Hesên Beg bû. Axaffînên wî hemû mesele û îşaret û nesîhet bûn. Rojêke zistanê (zivistan) bû, di meclîsa wî de bû behsa çakî, xirabî, wefadarî û bêwefayî. Dostan û xulamman yekî got filan mîr çak e, yekî digot na ev çak e, her yekî xeberek digot. Mîr jî guh didayê.

Paşê Mîr got: "Her kesê mizgîniya teyrê ji bo min bîne ez dê xelatekê bi kêfa wî bidimê." Xelkê jî wiha texmîn kirin. Mîr behsa mizgîniya teyrê biharê dike. Meqsêda Mîr tê negihîştin çî ye? Paşê got: "Nivê heyva Sibatê hat, reşêlek peyda bûn." Xulamêk çîst hat, gote Mîr: "Mizgîni li Mîr, reşêlek hat, ava bihar nêzik bû Mîr hiç cewab neda, deng nekîr. Hindekan gotin, çimku reşêlê kovî zû tê. Hê zivistan gelek maye, ev peyda dibê. Lê mîr çideng nekîr, sebr kirin, heta Legleg hat. Mirovek zû bezi hata hizûra Mîr got: "Mizgîni li cenabê Mîr be, ava Legleg hat". Dîsa Mîr hiç cewab neda. Xelkê gotin Legleg jî zû tê, wextê hatina wî hê maye befr û serma ye, bihar nîn e, lewma Mîr dîsa cewab neda.

Çend rojan xwe girtin. Wextê Newrozê ku hat hemûyan gotin wextê hatina ko'yî serê biharê ye, êdî eger Mîr bo ko'yî cewabî nede neheq e.

Mirovek hat, got: "Mizgîni li Mîr, ava ko hat, êdî bihar e Zistan çû" Dîsa Mîr cewab neda, xelkê teacub kir. Bo çî Mîr cewab neda. Firinge jî hat, mizgîni dane Mîr dîsa negot.

Xulasa: Çend teyrik ku zistanê diçine germiyan e hemû hatin bo hemiyan mizgîni dane Mîr, lê Mîr hiç cewab neda.

Mezin û muteberê meclîsa Mîr çûne cihekî bi tenê û rûniştin di gel hev ve axavtin. Gotin: "Em nizanin sebeb çî ye? Mîr qerara xwe bi cih nehanî ev şola bi hikmet nîn e. Çî caran Mîr ev edetan neşkandiye."

Mirovek hebû navê wî Mam Tal bû, tiranekir bû, gote van: "Rawestî, ez diçim bêjime Mîr, mizgîni li Mîr keşkele hat. Madem ku wî bo çî teyrî biharê xelat nedabin em ji çakê mizgîniya teyrekezistanê bidine wî." Hemî pê kenîn, gotinê: "Mam Tal tu dîn î, te çawa vî qebahetê kir, Mîr dê ji te sil be, eva nabe." Mam Tal got: "Bi Xwedê eger serî berye diçim we bêjim."

Welhasil: Mam Tal hat. Li nav derê dîwanxanê rawesta, destê xwe weke adetê wî zemanî li ser yekê danî, serê xwe çimand, gote: "Mizgîni li cenabê Mîr keşkele hat." Mîr got: Hay te mizgîni xoş bit, tu kuyî bi xer bihî. Di gel wî mizgîniyî aferîn bo aqil û tîgihîştîna te" Mam Tal ji wilo heyal kir, qey Mîr tirane bû wî diket.

Emma Mîr bi terane we nedîgot. Temam micid bû. Mîr gote pêş xizmetê xwe "Herre sako û şavelit min bo Mam Tal bîne. Înan dane wî" Mîr gote: "Li te ev xelat pîroz bit." Ehli meclîsê zêdetir teacub kirin. Gotne Mîr. "Ew hindet teyrit bihari temîs (temiz) û spehî hatin bo hemiyan mizgîni dane te û bo çîyan te xelat neda. Belî keşkela ku her car wextit salî daîmî li ser killangan pi dixut, te bo wi xelat da, evacî teaccubî ye. Mîr got. "Na eger ber eks ba, cî teacube bû."

Gotin: "Sebeb çî em tînegin." Mîr got: Elbete? heta bo hingu nehate beyan kirin, hingu ev hind fam niyefî bikin.

Sebeb ewe ye teyrit biharê hemî li du hevesat xwe digerin wexte xoşî û rihefî di gel me din emma dema ku piçek nêzikî tengawi û zehmeta zistane bûn me li nav zihmeta kurtanî (siztanî) bi tenî dihêlin kîfa xwe dikin, diçin. Emma keşkele eger çî pise, belî hemî wext di gel me ye. Li rihafî û zihmetî di gel me ye, refîqê, xwedanvefa ye, ew kinaetî diket bi pîsiyê ser kilîngit me. Bes dostî hev wefadar lazîm e her kes xelatî mizgîniya wî bidet. Refîkê dirist eva ye li xoşî û tengavi refîq bit, ne li xoşî bi tenê."

Hemiyan fermûde cenabi Mîr Hesên bi dil tesdiq kirin, wesselam.

Sabrî Ateş



Ji Zaxo û Behdînan çend bîrbirî

A) Selkek û komek sêva tê de heye (em nizanin çend sêvin). Şoreş hat, nivê sêvan rakir (bir) û niv sêvek, Azad hat, nivê sêvên mayîn û niv sêvek rakir, Çinar jî hat, nivê sêvên mayîn û niv sêvek rakir, çu tu sêv neman di selikê de. Çend sêv hebûn di selikê de, di destpêkê de?

B) Kasek (qasek) û hinde pere (dolar, dînar) tê de hebûn (em nizanin çend in). Helîs hat û çend pere tê de hebûn ewqas pare kirin tê de (bo nimûne eger 100 Dolar hebît, ewê 100 Dolar ên din jî kirin tê de 100+100=200 Dolar) û 40 Dolar rakir bo xwe ji kasê de. Kajîn hat ewê jî çend pare hebûn di kasê de piştî Helîsê ewqas pere kirin tê de û 40 Dolar rakirin bo xwe ji kasê de. Kahîn hat ewê jî çend pere hebûn di kasê de piştî Helîsê û Kajînê ewqas pere kirin tê de û 40 Dolar rakirin bo xwe ji kasê de, kase vala bû û tiştik tê de nema.

Çend pîre hebûn di kasê de, di destpêkê de?

C) Cikar (sêkar) kêşek e mezin ku hewyana wî bê cikare qet nedihat, rojekê qetya ji cikara ve û pere jî nebûn cikara bikirî. Ew rabû bo xwe li fasan (quna cikarê ya ku piçek maye cikare tewaw (xilas) bit anku hinde tutun tê de maye) bigerit, ewî 49 fas peyda kirin û ji her heft (7) fasan, êk cikare çêtkir.

Ew dê çend cikaran kêşit ji van 49 fasan?


D) Sê kur; Şêrman, Sîpan û Karwan çûn melevaniyê, ewan cilik (kinc) û tiştên xwe deynatin cem (nik) mirovekê ku biparêzît, ewan gote wî mirovî ku tiştêkê nedit kesekê heya hersê neyên cem wî. Dest bi melevaniyê kirin û piştî demekê Karwanî xwe dizî jî, hevalêt xwe û xwe gehand wî mirovê ku kinc û tiştên wan diparêzît, Karwanî ew xapand û ew tişt jê dizîn. Herdu hevalên din (Şêrman û Sîpan) tewaw bûn û çûn kincên xwe bikin ber xwe û tiştên xwe bistînin, lê ew tişt hatibûn dizîn, şerê wî zelamî kirin û ew kişandin dadgehê (mekemê). Li dadgehê dadgerî (hakimî) axivtinek kir piştî guhê xwe da gazindêt herdu alan, ew mirovê lê hatî skala kirin (şikayet kirin) nêzikê netewanbarî yê (negu-nehiyê) kir.

Dadgerî (hakimî) çî got?

Bersivê van bîrbiran wiha ne:

A: 7 sêv B: 35 dolar C: 8 cikare D: Dadgerî got tiştêk we cem mirovî ne, lê we gotibû van tiştan nede kesekê heya em hersê pêk ve neên cem te, hevalê xwe (karwanî) bibînin û herin hersê cem camêrî da tiştên we bidit we. Bê guman eger hevalê sêyemîn bibînin dê cilik û tiştan jî binin.

Gaffar Kiran



Guherînên civakî li Pêxwas qelibîn

Avnî, Garfield, Muhlis Bey, Hasbi Tembêl Er... û Qirix. Ne dûr e. Heke we di vê rûpelê de ev nivîs beriya 6 mehan bixwenda, we yê meraq kiribûna ka Qirix kî ye? Lê ev şeş meh e ku tîpa Qirix ketiye rojêva civaka Kurd. Ne tenê Kurd hêdî hêdî di civaka Tirk de jî cihê xwe digire. Îro di civaka Kurd de, ji kî bêpîrsîn, tîpa Qirix ku di rojnameya Özgür Gündem de diwêşe wê binasin.

Weke temamê gelên bindest di nav civaka Kurd de jî, ji berê de mîzah (pêkenîn) bi pêş ketiye. Bi dehan salan qedexetîya xwendin û nivîsandina Kurdî bûye astengî li ber pêşketina edebiyata nivîskî ya Kurdî. Ji ber vê yekê di nav gel de, bi pirranî edebiyata devkî gihîştîye û bi pêş ketiye. Bi taybetî jî pêşketina mîzahê li ser vê bîngê ava bûye û xemiliye. Lê belê heta ku ev mîzaha devkî ya di nav gel de karîkaturîze bibe demek dirêj derbas bû û hat heta sala 1992'yan.

Di sala 1992'yan de, bi derketina kovara mîzahê ya bi navê Tewlo, kêf û şahî, êş û derd, dijberî (çelişki) û psîkolojiya gelê Kurd bi awayekî mîzahî berbiçav bû. Lê Tewlo ji ber hin sedemên teknîkî û bi kêmbûna kadroya xwe ve, pîr nejiya.

Tîpa Qirix di vê pêvajoyê de afirî. Lê Qirix încax bi derketina rojnameya Özgür Gündem ji fikra Doğan Güzel daket nav jiyana civakî. Çawa tîpa Qirix derket derneket di demeke kin de bû malê gel. Qirixê Doğan Güzel ne ji "pêxwasên" ku di nav gel de xirab tînan zanîn e. Belê Doğan Güzel jî, bi vî Qirixî bi rê ketiye. Încax van kesan bi taybetî û tîkiliyên aktuel û populer ên civaka Kurdî ku bi guherînên tîkoşîna civakî û neteweyî re dide û wan bi vî awayî di çavê xwendevanan de şîrîn û sempatîk dike. Belkî jî ev kesên 'pêxwas' di nav gel de û bi vî şeklî bi çavên Doğan Güzel hat qebûlîkirin.

Di vê navê de, divê mirov qala çavdêriya Doğan Güzel a bêhempa jî bike. Bi rastî jî di şexsê Qirix de, Doğan Güzel jiyana civakî ya Kurdan û çanda tîkoşîne ya populer bi şeklekî zarîf û estetîk berbiçav dike. Me jî xwest ku xwendevan Doğan Güzel û Qirix binasin. Ji ber vê yekê me di mekaneke li gor daxwazên teklîfa wî de, vê hevpeyvîne jê re bir. Lê wî jî dilê me neşikand û bi hin şertên din (xwarinên xweş, fêkî; bi taybetî jî mûz, çaya qaçax, çixare û stranên Ciwan Haco) ev teklîfa me qebûl kir. Û ev hevpeyvîna me ya ku heta sisêyê sibê domiya, dest pê kir. Vêga em dora axaftinê didin Doğan Güzel û em çîroka Qirix jê guh-

darî dikin.

-Di 1970' yan de li Diyarbekir li taxa Elîparê hatim dinê. Heta lîseyê min li Diyarbekir xwend. Piştî ku min Unîversîteyê kar kir, ez hatim Stenbolê. Ez hê jî di Unîversîteya Mimar Sinan de, di beşa Plankirina Bajar û Herêman de, dixwînim.

Me pêşî te bi Tewlo nas kir. Tu karî ji xwendevanên me re qala pêvajoya heta tîpa Qirix bikî?

-Ez pêşî ve bibêjim ku jiyana min a xêzkirîne hebû. Berî Tewlo ez demekê di kovarên Girgîr û Avnî de xebitîm. Ew dem, xebatên min ên amatorîyê bûn.

Wisa be çawa û çima tu ji van kovaran veqetiyayî û derbasî kovareke wek Tewlo bûy?

-Gelek sedemên ve yekê hene. A girîng, min cihê xwe yê di van kovaran de nepejirand. Li aliyê din, di jiyana min a dibistanê de hin pirsgrêk çêdibûn. Lê bi bîngê min nedixwest ez di van kovaran de bixebitîm. Û ez ji wan veqetiyam. Salek, salek û nîv li tu derî nexebitîm. Di vê pêvajoyê de hin kesên nas di amadekariya

projeya kovareke mîzahî ya Kurdî de bûn. Bi vî awayî bi min re ketin tîkiliyê. Û me dest bi weşandina kovara Tewlo kir.

Tîpa Qirix di vê pêvajoyê de di serê te de şekil girt?

-Erê. Min bi Kurdî zanibû û min jiyana Kurdistanê nas dikir. Ji ber vê yekê, di Tewlo de bi taybetî ez li ser regezên (element, unsur) Kurdistanê sekinîm. Tîpa Qirix jî hino hino di vê pêvajoyê de çêbû. Lê ji ber ku Qirix û zîmanê wî li gor min ji hev nedihat cudakirin û ji ber ku min bi giştî karîkaturên bi Kurdî xêz dikir, tîpa Qirix wê demê derneket holê. Piştî ku Tewlo hat girtin û bi derketina rojnameya Özgür Gündem re firseta derketina tîpa Qirix jî çêbû.

Qirix berhemê kîjan şertên civakî ye?

-Berî her tiştî Qirix tîpeke lumpen ê bajariyê Kurdistanê ye. Qirix her çiqas bajarî be jî, pê re çanda feodalîteyê jî heye. Lê Qirixê min bi tevahî ne ev e. Taybatiya wî ya mezin ew e ku, di bin tesîra guherînên civakî yên li Kurdistanê dimîne ye. Lê di rasti-


ya xwe de ev tîpa ku xirab e (nebaş e) û nayê hezkirin, bi jiyana xwe ya ku bi tesîra guherînên civakê diguhere, ji alî gel ve tî hezkirin û şîrîn xuya dibe.

Çima ne kesên din lê te Qirixan kire tîp?

-Carekê ez bi siûd bûm ku min qirixan nas dikir. Û ev çanda qirixiyê li her deverê Kurdistanê heye, tî zanîn. Û ev kes ji alî mijarê ve ji bo karîkaturîzekirîne gelek musaît bûn.

Sedemê cihgirtina tîpa Qirix ku hem li Ewropa, hem li Tirkiye û hem jî li Kurdistanê belav bûye çi ye?

-Jixwe di vî warî de valahiyek



Doğan Güzel

hebû. Gava berhemeke wisa bi seviye derket di nav gel de eleqeyek zêde dît. Ji aliyê din ve jî, di vê demê de dijberiyên ku Qirix diji di herkesî de parçeyek jê hebû.

Di xwazi em hinek jî li ser qehremanên banta Qirix-bixivîn. Kî ne ev? Tu karî wan bidî nasîn?

-Berî teva Keko heye. Keko qirixek e. Navê wî hîn ez jî nizanîm. Mirovekî betal e. Mala wî ya pêşîn qehwe ye. Weke jiyana gelek qirixan, nava wî û malbata wî, bi taybetî jî tîkiliyên wî yên bi bavê wî re, ne baş in. 'Dawayeke wî ya platonîk heye. Hevalên wî yên hêja Çeto, Siyasî Abê û endamekî qehweyê ye ku amadekariya Unîversîteyê dike -lê ez navê wî nizanîm- heye.

Siyasî Abê: Niv-ronakbirekî Kurd e. Heta jê tî hevalên derdora xwe politîze dike. Bi şexsiyeta xwe ji qirixan ewqas jî ne dîr e. Dibe ew jî di paşerojê de qirixek bûbe. Û di jiyana qirix de hêzên dewletê hene ku hem ji wan ditirse û hem jî, ji wan hêrs dibe.

Pêseroja Qirix?

-Qirix qehremanekî aktuel e. Wê di bin tesîra guherînên civakî de bimîne û an wê ew jî bi civakê re biguhere an jî wê biqede. Bi herdu awayî jî, ezê jî aliyê mîzahiyê ve Qirix biqedînim.


Doğanê delal, em ji bo vê hevpeyvîne spas dikin. Lê tiştêkî ku me ji te nepirsî be û tu bixwazi bibêji heye?

-Ma ez enayî me, piştî ku hevpeyvîn qediya ez xwe biêşînim û hê jî dirêj bikim. Ev besî we ne, ezê herim razem, xewa min tî.

Bi rastî jî me ew pîr westand û rabû çû raza. Jixwe saet jî hatibû 4'ê sibehê.

Hevpeyvîn:

R. Baxdû - M. Ergin



Qirix (Kink) û dijberiyên wî bi hev re...

welat

- Li ser navê ÎMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyarê Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyarê Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmusaşip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewropa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rua G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkîrîn (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkîrîn (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ